


## Bêhna lîstokan tê!

Pêvajoya çareseriyê bi germî despê kiribû, lê di van her du mehên dawî de hinek sistayî û xemsarî tê xuya kirin ji aliyê dewletê ve. Bi avakirina Komisyona Meclisê re, hêviya pêşveketina pêvajoyê zêdetir bû, hinek gavên pozitîf-kêrhatî jî... *Ahmet Aktaş/R.8*



## Dewleta tampon

Zanyarê siyasî yê Amerîkî John Mearsheimer di pirtûka xwe ya sala 2001an de a bi sernavê The Tragedy of Great Power Politics nivîsandiye: "Sîstemên pirqutbî", ku ji hêla gelek aktorên bihêz ve têne xuyakirin, bi xwezayî ji... *Kurdistan Lezgiyeva/R.7*



## Civak li benda hêviyê ye

"Mafê Hêviyê" ango (right to hope), li gorî hiqûqa navneteweyî, mafek e ku girtiyên cezayê zindanîbûna demdirêj bi taybetî zindanîbûna muebetê li wan hatiye birîn, heq dide ku rewşa wan piştî demeke diyarkirî were nirxandin û ji bo berdana... *Felemez Ulûg/R.6*


15 - 21 Îlon 2025
*Hejmar:* 300
*Buha:* 20 TL
rojnameyaxwebun@gmail.com

# xwebûn

xwenasîn e


## Ziwanê ma rê statu şarê ma rê azadî

Helbet bingeyê nê meseleyî de zanayîş û nêzanayîş ferq nêkeno. Her gedeyo kurd zano ke pê wendişê sondî merdim tirk nêbeno. No ziwan ziwanê to nîyo, çunke nê ziwanî reyde ti rehet nêeşkenî xo îfade bikerî. To nê ziwanî reyde hes nêkerdo, kay nêkerdo, nêqîrayî/ya, nêbermayî/ya, nêhuyayî/ya, pêro nêdayo, nengî nêçînayî/ya. Herçiqas ti bi fek biwazî bibî tirk, labelê ti raştî de qetî endamê nê mîletê tirk nêbenî. Seba ke cematê to xo ra nêvano ma tirk î, vano ma kurd î û cemato tirk zî to tirk nêvîneno. To rê vanî yan şakî yan zî rojhelatî. Bingeyê nê meseleyî de helbet bindestîya kurdan û kolonyalîzm est o. Her kes zano ke erdê kurdan de kurdî xo bi xo, xo îdare nêkenî. Ne wayîrê erdê xo yê... *R.9*

## Em perwerdehiya bi kurdî dixwazin

Wa ye dîsa vebûn bi sed hezaran dibistanên li Tirkiye û Kurdistanê. Dîsa dest bi perwerdehiya bi tirkî kirin di her astê de, ji pêşdibistanê bigir heta zanîngehê. Dîsa bêpar man zarok û ciwanên kurdan ji perwerdehiya bi kurdî. Ji sed salî zêdetir e ku em kurd bi polîtîkayên mêtingeriyê yên wekî înkar û tunehesibandinê re rû bi rû ne. Ziman, çand û nasnameya me tûne tên hesibandin û tên qedexekirin. Wekî civak û netewe me ev yek qebûl nekiriye û ji Serhildana Koçgiriyê bigire heta îro me bi dehan caran îtiraz kiriye û serî rakiriye. Pergala mêtinger li şûna ku dev ji neheqiya xwe berde zilim li me kiriye, em kuştine, gundên me şewitandine û em mişext kirine... *Mûsa Şanak/R.5*

## Ew mehkûm, bersûç û dozdarê Tirkiyeyê bû

Rewşenbîr û zanyarê kurd Apê Mûsa ji bo azadiya gelê kurd û Kurdistanê ked û bedelên giran da. Bi minasebeta salvegera şehadeta Apê Mûsa em wî bi rêzdarî bi bîr tînin û kurte jiyana wî bi xwînerên xwe re parve dikin. Ronakbîr û rewşenbîrê kurd Mûsa Anter bi navê din Apê Mûsa di sala 1920an de li gundê Zivingê yê bi ser Stîlîliyê ya Nisêbîna Mêrdînê ji dayik dibe. Apê Mûsa hêj zarok bûye bavê wî diçe ber dilovaniya Xwedê. Li ber destên dayika xwe Feslayê mezin dibe. Dayika Fesla jineke gelekî jîr û jêhatiye ku di salên 1930-1940an de muxtariya gund dike. Di heman demê de dibe muxtara pêşîn a jin a bakurê Kurdistanê. Apê Mûsa dibistana xwe ya... *R.11*



## Rastiya qirkirin û talanê

Bi salan e xwezaya Kurdistanê ya ser erd û bin erd bi destê dewletê tê talankirin, bi taybetî jî daristan, berê dişewitandin niha jî dibirin. Dewlet daristanên li Kurdistanê bi destê cerdevanan dide birin û gelek kes di nava vê tora qirkirinê de cih digire. Wekî çapemenî em jî armanc dikin ku vê talan û qirkirina li ser erdnîgariya xwe bi raya giştî re parve bikin ku pêşî lê bê girtin. Hevalê me rojnameger Nedîm Orûç ku ji herêmê ye, li ser vê talan û qirkirinê nerîn û çavdêriyên xwe bi me re parve kir. Nedîm Orûç destnîşan dike ku ligel polîtîkaya dewletê û birîna daristanan a bi destê cerdevanan, gundî jî ji bo pereyan dixwazin daristan bên birin. Orûç aşkera dike ku gelek kesên ku dibin şirîkê vî sûcî jî hen û ji aliyê saziyan ve tên parastin. Herwih Orûç dibêje mijara sereke ya sazî û partiyan jî ne pêşî lêgirtina talanê ye... *R.8*

# Mafê hêviyê gerdûnî ye

Mafê Hêviyê mafekî jiyanî û gerdûnî ye. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nêzî 27 sal in di şertê tecrîdê de tê ragirdin. DMME vê wekî îşkenceyê pênase dike û dixwaze Tirkiye Mafê Hêviyê nas bike



Li gorî biryara DMMEyê her girtiyên ku cezayê muebeta xwarine, xwedî Mafê Heviyê ye ku piştî 25 salan, serbest bêne berdan. DMMEyê di 2014an de biryar da ku Tirkiye Mafê Hêviyê nas bike. Lê 11 sal borîn, hîna Tirkiye ji bo Mafê Heviyê tu gavên şênber neavêtiye. Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê dê di 15-17ê Îlonê de kom bibe. Di civînê de dê mijara "Mafê Hêviyê" jî bigirin dest. Beriya civina Komîteya wezîran; ÇHD, Baroya Amedê, Baroya Colemêrgê, Baroya Rihayê, Baroya Wanê, Baroya Şirnexê, ÎHD, OHD, Weqfa Civak û Lêkolînên Hiqûqî, TÎHVê xwestin Tirkiye Mafê Hêviyê nas bike. Kurd ji bo Mafê Hêviyê dê rêzeçalakiyan pêk bînin.


Serokê Giştî yê ÇHDê Murat Yilmaz li ser girîngiya Mafê Hêviyê nirxandin kir û got: "Li gorî xala 3yemîn a DMMEyê girtina heta heta sûcê îşkenceyê ye. Dibe hûn kesekî bigirin û heta demekê girtî bihêlin. Divê girtî zanibe dê kengî bê berdan. Nêzî 4 hezar girtiyên ku cezayê muebet giran girtine hene. Ev îşkence ye. Ev ne qanûnî ye. Meseleya civakî ye. Divê civak li dijî vê yekê refleksê nîşan bide û bibêje rawest e. Eger mafê kesekî bê binpêkirin di rastiya xwe de mafê me tevan tê binpêkirin. Mafê Hêviyê mafê mirovan e. Mafê Hêviyê li dijî îşkenceyê ye. Mafê Hêviyê mafê gerdûnî ye. Divê hemû girtî ji mafê hêviyê sûdê bigirin û ji bo wê divê Tirkiye zagonên xwe ji nûve saz bike." ... *R.3*

## Felsefaya jiyana azad

Endama Lijneya Weşanê ya Kovara Jineolojiyê Ayşe Ayaz der barê Jin Jiyan Azadî de got: "Bûyerên ku îro diqewimin em nikarin tenê bi roja xwe ve girêbidin. Li ser vê axê rastiya Tevgera Azadiya Jinan heye, çanda berxwedanê heye. Ev tevger koka xwe ji berxwedana xwedawendî digre. Tekoşîna azadiya jinên kurd di sosyolojiya heremê de gelek guhertinên mezin çêkir. Hewl da ku di her qada jiyanê de sekna serbixwe û azad biafirîne. Ev rastî di 50 salên dawî de hemû guhertinan de ristekî mezin lîst. Di rastiya civakan de li hember koletî û bindestiyê her tim nepejirandin heye. Vê seknê birexistinkirin, hêza guhertinê ava kirin û avakirina rista pêşengtiyê bi tekoşîna jinên kurd ve giredayî ye. Lewma dirûşmeya Jin Jiyan Azadî ne tenê dirûşmeyeke ji rêzê ye. Rastiyekî dîrokî û sosyolojîk di nav xwe de dihewîne. Jin jiyan e û divê jiyan were azadkirin. Ev bi xwe felsefeya jiyana azad e... *Hevpeyvîna Xecê Şen/R.4*

## Jin Jiyan Azadî zimanê hevpar ê têkoşînê ye

Di 16ê îlona 2022yan de dema jina ciwan a kurd Jîna Emînî ji aliyê "Polîsên Exlaqê" ve hat kuştin, li piraniya bajarên Îran û Kurdistanê li dijî rejîma Îranê bi dirûşma "Jin Jiyan Azadî" çalakî hatin destpêkirin. Bi van çalakiyên ku destpêkirin re ji bo hemû jinên cihanê jî pêvajoyek nû dest pê kir. Dirûşm ango felsefeya Jin Jiyan Azadî keda bi dehan salan a Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û jinên kurd ên ku li dora wî kom bûbûn hat vê astê. Dirûşma Jin Jiyan Azadî di sala 1990an şûnve di nav şervanên PKKê de hat bikaranîn û bi demê re li qadên civakî, çandî û siyasî belav bû. Bi taybet jî nirxandinên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ên ku li ser kolekirina jinan û têkoşîna jinan a ku li dijî vê ferasetê meşandine, di avakirina vê felsefeyê de bû bingeheke xurt. Felsefeya ku di nav jinên kurd de bi rêberiya Abdullah Ocalan de pêş ket û li Rojava jiyanî bû, di 2022yan de bi kuştina Jîna Emînî gerdûnî bû. Dema Jîna Emînî li goristanê dihat binaxkirin gelek kes dirûşma Jin Jiyan Azadî berz kirin. Ev dirûşm ji bajarê Seqizê bi rê ket û li hemû bajarên Îran û Kurdistanê belav bû. Ev dirûşma efsûnî ji ber wate û keda di avakirina wê de hatiye dayîn, ji bo hemû kesên ku di hewldana xelasbûna ji bindestiyê de ne bû hêvî. Ew qêrîn ne tenê dirûşmeke ji sê peyvan pêk tê ye. Ew felsefeya jiyanê ye. Ji ber vê yekê ye ku li Parîs, Berlîn, Stockholm, New York, Stenbol û gelek navendên mezin belav bû. Dema em îro lê dinêrin di hemû çalakiyan de dirûşma ku esas tê girtin Jin Jiyan Azadî ye. Xwedîderketina li vê dirûşmê pir xurt e. Kesên ku dixwazin dirûşma Jin Jiyan Azadî fêm bikin, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan zêdetir dixwînin. Her ku wî dixwînin hêj bi dengekî bilindtir vê dirûşê berz dikin. Ev jî nîşan dide ku Jin Jiyan Azadî ne tenê dirûşm e, felsefeya jiyana azad e... *Medya Bal /R.2*



# Jin Jiyan Azadî zimanê hevpar e

Piştî Serhildana Jin Jiyan Azadî ya li Rojhilat, hemû kesên ku di lêgerîna azadiyê de ne xwe li dora vê dirûşmê bi rêxistin kirin. Jin Jiyan Azadî ji bo hemû kesan bûye zimanê hevpar ê jiyana wekhev

Medya Bal

Di 16ê îlona 2022yan de dema jina ciwan a kurd Jîna Emînî ji aliyê “Polîsên Exlaqê” ve hat kuştin, li piraniya bajarên Îran û Kurdistanê li dijî rejîma Îranê bi dirûşma “Jin Jiyan Azadî” çalakî hatin destpêkirin. Bi van çalakiyên ku destpêkirin re ji bo hemû jinên cihanê jî pêvajoyek nû dest pê kir. Ev dirûşma ku li Rojhilat dihat berzkirin tevî ku gelek kesan nû bihîstibû jî di esasê xwe de dirûşmek nû nîn bû. Dirûşm ango felsefeya Jin Jiyan Azadî keda bi dehan salan a Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û jinên kurd ên ku li dora wî kom bûbûn hat vê astê.Dirûşma Jin Jiyan Azadî di destpêkê de ji sala 1990an şûnve di nav şervanên PKKê de hat bikaranîn û bi demê re li qadên civakî, çandî û siyasî belav bû. Bi taybet jî nirxandinên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ên ku li ser kolekirina jinan û têkoşîna jinan a ku li dijî vê ferasetê meşandine, di avakirina vê felsefeyê de bû bingeheke xurt. Rêber Apo kolekirina jinan wek ‘mêtîngeriya yekem’ dinirxîne û li dijî vê kolekirinê dibê “Heta jin azad nebe civak azad nabe.”

**Pratîkkirina dirûşmê**

Wek tê zanîn di 2011an de “Bihara Ereban” dest pê kir. Bi “Bihara Ereban” re gelên bindest li dijî desthilatdariyên heyî ketin lêgerîna mafên xwe. Ev pêngava ku li hemû Rojhilata Navîn belav bû, helbet bandora xwe li Sûriyeyê jî kir. Kurdên ku bi salan bû li wir tune dihatin hesibandin, hewldanên xwe yên azadî û wekheviyê hêj xurttir kirin û di sala 2012an de Rêveberiya Xweser li Rojava îlan kirin.

Di nav vê pergala ku hat avakirin de fikr û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan esas hat girtin. Di nav vê pergalê de jinan bi têkoşîna ku di qada



siyasî, çandî, civakî û leşkerî de dan, xwe bi hemû gel dan qebûlkirin û derz li wê civaka baviksalar xistin.

Bi demê re hevserokatiya ku pêş ket bandora xwe li ser civakê zêde kir û di hemû sazî û dezgehan de kotaya ji sedî 50 jin esas hat girtin. Kotaya ku esas hat girtin rê li ber avakirina komîsyon û meclisên jinan vekir. Her wiha jin di bin banê Yekîneya Parastina Jin (YPJ) de di nav şer de jî xweseriya xwe îlan kirin. Ev pêşketinên ku pêk hatin nîşan dan ku Jin Jiyan Azadî ne tenê dirûşm e, lê di heman demê de modela rêveberiyek û civakek nû ye.

Felsefeya ku di nav jinên kurd de bi rêberiya Abdullah Ocalan de pêş ket û li Rojava jiyanî bû, di 2022yan de bi kuştina Jîna Emînî gerdûnî bû. Dema Jîna Emînî li goristanê dihat binaxkirin gelek kes tevî êrîş û zextên rejîma Îranê jî bi girseyî kom bûn û dirûşma Jin Jiyan Azadî berz kirin. Ev dirûşm ji bajarê Seqizê bi rê ket û li hemû bajarên Îran û Kurdistanê belav bû. Her kesên ku li dijî rejîmê dixwest dengê xwe bilind bike bihîstin, dirûşma Jin Jiyan Azadî berz dikirin. Ev dirûşma efsûnî ji ber wate û keda di avakirina wê de hatiye dayîn, ji bo hemû kesên ku di hewldana xelasbûna ji bindestiyê de ne bû hêvî. Ew qêrîn ne tenê dirûşmeke ji sê peyvan pêk tê ye. Ew felsefeya jiyanê ye. Ji ber vê yekê ye ku li Parîs, Berlîn, Stockholm, New York, Stenbol û gelek navendên mezin belav bû.

Wek tê zanîn dîroka têkoşîna jinan bi qasî desthilatdariya mêrperest kevn e. Di her demê de jinan têkoşîna xwe domandiye. Di demên dawî de femînîzma ku li rojava pêşketiye, di mijara jinan de zêdetir derdiket pêş. Lê ji ber ku femînîzm zêdetir ji bo mafên takekes têdikoşiya û destkeftiyên ku bi dest xistiye mayînde nedikir, nikaribû xwe bigihanda hemû jinan. Lê felsefeya ku Jin Jiyan Azadî heyî dike bi azadiya jinan re guhertin û veguhertina civakî jî esas digire. Belkî ji ber vê yekê ye ku dikare ji Hîndistan heta Amerîkayê, ji Amerîkayê heta Ewropayê û hemû Rojhilata Navîn xwe bigihîne hemû jinan û bibe felsefeyek hevpar.

Dîsa di roja me de ji bilî jinan her ferdek civakê yê ku bixwaze di nav jiyaneke aram û bê şer de bijî zêdetir xwe nêzê vê felsefeyê dibîne.

**Qedexekirina dirûşmê**

Wek ku me li jor jî anî ziman dirûşma Jin Jiyan Azadî ji ber ku encama felsefeyekê ye, di gelek deman de bûye hedefa desthilatdarên mêr. Li Tirkiyeyê dirûşma Jin Jiyan Azadî bi taybet piştî 2010an zêdetir hat bikaranîn, ji ber vê yekê hikûmetê kesên ku ev dirûşmê berz dikir, hedef digirt.

Li Îranê jî di serhildana Jin Jiyan Azadî de bikaranîna vê dirûşma bi kurdî, ji bo Îranê wek xetere dihat qebûlkirin. Belkî ji ber vê yekê bû ku wergera dirûşmê (Zen Zendegî Azadî) hat kirin û bi vî halê xwe jî li gelek bajarên farsan hat bikaranîn.

Di sala 2023yan de dema Meşa Jinan a Parîsê hat lidarxistin, jin li dora dirûşma Jin Jiyan Azadî kom bûn. Dîsa saziyên wek Amnesty International, Human Rights Watch, UN Women ev dirûşmê di çalakiyên xwe de bikaranîn.

Dîsa di 2023yan de Yekîneya Jinan a Neteweyên Yekbûyî rapor li ser dirûşma Jin Jiyan Azadî amade kir û gotin Jin Jiyan Azadî zimanê hevpar ê têkoşîna jinan e.

Dema em îro lê dinêrin di hemû çalakiyan de dirûşma ku esas tê girtin Jin Jiyan Azadî ye. Xwedîderketina li vê dirûşmê pir xurt e. Kesên ku dixwazin dirûşma Jin Jiyan Azadî fêm bikin, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan zêdetir dixwînin. Her ku wî dixwînin hêj bi dengekî bilindtir vê dirûşê berz dikin. Ev jî nîşan dide ku Jin Jiyan Azadî ne tenê dirûşm e, felsefeya jiyana azad e.

## Têkoşîna xwe bi mirina xwe jî domand

Navenda Nûçeyan

Yek ji kesayeta herî girîng a gelê ereb bi taybet jî ya Misrê Doria Shafik di 20ê îlona 1975an de li Çemê Nîlê pişta xwe dide cîhanê û ‘diçe bayê’. Doria Shafik yek ji aktîvîsta herî girîng a mafên jinan bû. Jiyana wê çîrokeke zanîn û hêzê bû, lê di heman demê de rûbirûbûneke xemgîn bi qelsiyên vekirî yên serdemekê re jî bû.

Doria Shafik di sala 1908an de li Misrê ji dayik bû. Wek jineke xwende û ronakbîr, wê ne tenê qalibên kevneşopî yên serdema xwe şikand, di heman demê de bû kesayetek pêşeng a di têkoşîna ji bo mafê jinan ê perwerdehiyê, mafê dengdanê û azadiya civakî. Xwendina wê ya felsefe û wêjeyê li Zanîngeha Sorbonne ya Parîsê, vîzyonek berfirehtir da wê û xwesteka wê ya ji nû ve pênasekirina cihê jinan di civakê de xurt kir.

Têkoşîna wê ya ji bo mafên jinan a li Misrê ne tenê di gotinê de bû. Doria Shafik bi rêya kovara xwe ‘Beyanât’ bû dengê jinan. Xwepêşandanan organîze kir û daxwazên jinan rasterast ji hikûmetê re ragihand. Meş û kampanyayên daxwaznameyê yên dîrokî yên ji bo mafê dengdana jinan ên ku di sala 1951an de ku ber bi parlementoyê ve hatin kirin, di nav mînakên herî berbiçav ên biryardarî û serokatiya wê ya xurt de bûn. Lê belê, ev wêrekî û têkoşîn ji hêla hêzên otorîter ên wê demê ve bi awayeke erênî nehatin pêşwazîkirin. Doria Shafik gelek caran hat girtin, rastî zilmê hat û ji hêla hêzên civakî yên muhafezekar ve hat tecrîdkirin.

Tiştên ku bûn sedema mirina wê ne tenê pirsgirêkên tenduristiya fîzîkî bûn, lê di heman demê de tenêtî û şikestina kûr a civakî jî bû. Astengiyên ku wê di dema têkoşîna ji bo mafên jinan dida de pê re rû bi rû ma, zordariya dewletê û bertekên hin hêzên di nav civakê de, Doria Shafik ber bi rewşeke ku her ku diçû paşve diçû ve birin. Trajediya wê ne ew bû ku têkoşîna wê ya ji bo azadiyê bê xelat ma, lê ew bû ku ew di bin giraniya wê têkoşînê de hat perçiqandin.

Îro, dema ku em jiyana Doria Shafik bi bîr tînin, divê em ne tenê wêrekiya wê, lê di heman demê de rêya dijwar û bi êş a têkoşîna ji bo mafên jinan jî bi bîr bînin. Berxwedana wê berdêla bilind a ku ji bo azadî û wekheviyê hatiye dayîn nîşanî me dide. Divê Doria Shafik wek qehremanek bimîne, ne wek qehremanek ku di rûpelên tozî yên dîrokê de hatiye veşartin, lê wek qehremanek ku îlham bide nifşên nû bê dîtin.

Divê em ji bîr nekin ku bêdengî di têkoşîna azadiyê de tê wateya windakirinê. Doria Shafik li hember vê bêdengiyê teslîm nebû; lê belê, bi dawîkirina jiyana xwe, wê bi bîr xist ku divê em têkoşînê bidomînin.

Di hejmara 299an a Rojnameya Xwebûnê de Sorgul Şêxo bi sernava ‘Di xwekuştinê de jî kujerek heye’ nivîsek nivîsîbû û behsa xwekuştina jinan û kujerên veşartî dikir. Dema mirov li jiyana Doria Shafik jî dinêre ya ku dawî li jiyana xwe aniye ne ew e civak bixwe ye. Li dijî mirinên bi vî rengê ya ku dikeve ser milê me hevgirtin û rêxistinbûn e. Êdî wek jin tehemula me ji wendakirinê re nemaye û divê em li gor vê yekê karibin xwe û derdorê xwe ji hişmediya paşverû biparêzin.

# Îlhama ku Gurbetellî Ersoz dide

Serdil Akdag

Di seranserê dîrokê de, jinan di têkoşînên civakî, çandî, hunerî, rojnamegerî, siyasî û zanistî de ji bo dengê xwe bidin bihîstin, bi dijwariyên mezin re rû bi rû mane. Her çiqas wêrekî û berxwedana jinan gelek caran bi xelatên taybet hatibin xelatkirin jî qebûlkirina wan a di nav jiyanê de hêsan nebûye.

Lê ev xelat ji aliyek ve jî girîng in. Ji ber ku van xelatan ne tenê destkeftiyên jinan ên takekesî, lê di heman demê de têkoşîna wan a ji bo hebûnê ya di nav civakê de jî sembolîze dikin. Yek ji van xelatên ku dê hêz bide jinan jî dê îsal li ser navê Gurbetellî Ersoz were dayîn.

Gurbetellî Ersoz di 11ê tîrmeha 1965an de li Xarpetê hat dinê û di hemû jiyana xwe de bi kesayeta xwe ya têkoşer li ber xwe da. Gurbetellî Ersoz a kîmyager ji komkujiyên Çernobîl û Helepçeyê pir aciz bûbû. Vê aciziyê wê ber bi lêgerînan ve dibir. Di 1990î de bi hinceta endamtiya PKKê hat girtin û piştî du salan hat berdan. Gurbetellî Ersoz dema hat berdan bi dirûşma ‘Dê rastî di tariyê de nemînin’ di rojnameya Ozgur Ulkeyê de dest bi rojnamegeriyê kir. Gurbetellî Ersoz di dîroka Tirkiyeyê de wek yekemîn gerînendeya jin navê xwe nivîsand. Îsal dê cara yekemîn rojnamegerên jin ên kurd li ser navê Gurbetellî Ersoz xelatên rojnamegeriyê bidin.

Heta niha xelatên wek Xelata Emmeline Pankhurst (Îngilistan-rojnamegerî), Xelata Nellie Bly (Amerîka-ji bo rojnamegerên wêrek) hatine dayîn. Herwiha Xelata Rojnamegerên Jin a Navneteweyî jî ji bo dengê jinan bide bihîstin tê dayîn. Lê tu xelatên ku me navê wan rêz kiriye naşibin xelata ku li ser navê Gurbetellî Ersoz tê dayîn. Gurbetellî Ersoz ne tenê bi nasnameya xwe ya rojnameger bi nasnameya xwe ya têkoşer jî ji bo hemû jinan dibe mînakek bêhempa. Têkoşîna wê hem ji bo nasnameya wê hem jî ji bo pîşeya wê dibe sembol.

Xelata Gurbetellî Ersoz, ku îsal cara yekem dê bê dayîn, rûyê bêhempa yê têkoşîna jinên kurd a li dijî zextên dewletê û wêrekiya rojnamegerên kurd jî nîşan dide. Ev xelat ji bo têkoşera bangeke ku îlhamê dide ye.

Taybetmendiya xelatê ne tenê di navê wê de ye, lê di heman demê de di şiyana wê ya ronîkirina zilm û berxwedana dîrokî ya ku jinên kurd jiyan kirine de jî heye. Li gel têkoşîna demdirêj a Çapemeniya Azad, ev xelat ne tenê sembola destkeftiyên takekesî, lê di heman demê de sembola berxwedan û hevgirtina kolektîfe jî.

Jiyana Gurbetellî Ersoz nîşanê me dide ku rojnamegeriya jinan ne tenê ragihandina nûçeyan e; ew di heman demê de têkoşîna ji bo nasname, azadî û mafan e. Ji ber vê yekê, ev xelata li ser navê wê sembola destpêka serdemeke nû ye di bihîstina dengê jinên kurd ên li çar aliyê cîhanê de.

Ev xelat ne tenê bîranînek e; ew di heman demê de nîşaneya berbiçav a hêvî, berxwedan û biryardariya ji bo pêşerojê ye. Her rojnamegereke jin ku li ser şopa Gurbetellî Ersoz dimeşe, bi vê xelatê, namzetek e ku bibe mîmarê têkoşîna azadiyê ya siberojê.



# Mafê Hêviyê mafê her kesî ye

Serokê Giştî yê ÇHDê Murat Yilmaz anî ziman ku israra li dijî mafê hêviyê îşkence ye û xwest hemû kes li dijî îşkenceyê dengê xwe bilind bikin û got: “Mafê hêviyê mafê her kesî ye. Divê hemû beşên civakê ji bo mafê hêviyê dengê xwe bilind bike.”

| Mehmet Alî Ertaş

Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê dê di 15-17ê Îlonê de kom bibe. Di civînê de dê mijara “Mafê Hêviyê” jî bigirin dest. Rêxistinên mafên mirovan û rêxistinên hiqûqê yên berê agahî bi komîteyê re parve kiribûn, di 11ê îlonê de li navenda giştî ya ÎHDê kom bûn. Li ser navê ÇHD, Baroya Amedê, Baroya Colemêrgê, Baroya Rihayê, Baroya Wanê, Baroya Şirnexê, ÎHD, OHD, Weqfa Civak û Lêkolînên Hiqûqî, TÎHVê daxwazên xwe ji Komîteya Wezîran anîn ziman. Serokê TÎHVê Metîn Bakkalci, serokê Giştî yê ÎHDê Huseyîn Kuçukbalaban, serokê Şaxa ÇHDê yê Enqereyê Mûrat Yilmaz û endamên OHDê beşdar bûn.

Parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di sala 2003yan de ji bo Mafê Heviyê serî li DMMEyê dan. Dadgeha Mafên Mirovan (DMME) piştî 11 salan di 18ê adara 2014an de, der heqê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de biryara mafê heviyê dabû. DMMEyê di biryarê de, cezayê muebbeta girankirî yê bêyî mafê berdana bişert a Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di çarçoveya mafê hêviyê de nirxand û weke binpêkirina xala 3yemîn a Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê (PMME) nirxand. DMMEyê bi vê yekê re cara ewil têkildarî mafê hêviyê, ji bo Tirkiyeyê biryara binpêkirinê da.

DMMEyê ji bo dosyayên girtiyên li Girtîgeha Boluyê Hayatî Kaytan, Emîn Gurban û Civan Boltan jî biryara binpêkirinê dabû. Lê li gel ku bi ser re deh sal û nîv derbas bûne jî hêj Tirkiyeyê di vê mijarê de tu sererastkirin di qanûnên xwe de nekiriye. Ji ber vê helwesta Tirkiyeyê jî Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê neçar ma ku têkildarî Tirkiyeyê pêvajoya venêrînê bide destpêkirin.




Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê di 19ê îlona 2024an de biryara navberê da. Komîteyê, careke din got divê mekanîzmeyeke ku dem bi dem cezayê muebbeda girankirî jinûve ber çavan derbas dike were avakirin. Lê tevî ku salek derbas bû jî hikûmeta Tirkiyeyê tu gavên çareseriyê neavêt. Komîteyê fikarên xwe anî ziman û bang kir ku gavên pêwîst tavilê bên cîbicîkirin. Komîteyê têkildarî hikûmxwarên muebeda girankirî agahiyên berfireh ji Tirkiyeyê xwest. Lê heta niha Tirkiyeyê tu gavên şênber neavêt. Ev nîşan dide ku Tirkiye berpirsyartiyên xwe yên navneteweyî bi cih nayîne.

Di ser biryara “Ocalan 2” û yên der heqê Hayatî Kaytan, Emîn Gurban û Civan Boltan de zêdetirî 10 sal derbas bûn. Lê hêj jî bi hezaran girtî ji mafê hêviyê bêpar tên hiştin û wiha pê de çû: “Komîteya li Dijî Îşkenceyê ya NYê di rapora xwe ya 14ê tebaxa 2024an de ragihand ku hêj niha jî li Tirkiyeyê zêdetirî 4 hezar girtiyên cezayê muebeda girankirî lê hatiye birîn hene. Ev rejîma cezayê, bi xwe re encamên giran û rûxîner tîne, jiyana mirovan û hêviya girtî û malbatên wan tune dike.

Komîteyê xwest ku Tirkiye qanûna înfazê ya Hejmar 5275 û Qanûna Cezayan a Tirkiyeyê li ber çavan re derbas bike, kesên cezayê muebbeda girankirî lê hatiye birîn piştî demekê maqûl bên berdan û cezayên wan bên kêmkirin. Lê Tirkiyeyê di tu planeke xwe ya çalakiyê de gavek neavêt.

Wezîrê Dadê Yilmaz Tunç di 14ê gulana 2025an de ragihand ku dê tu sererastkirinên qanûnî neyên kirin. Ev daxuyanî nîşan dide ku hikûmet naxwaze tu sererastkirinan bike û helwesta wê ya li hemberî biryarên DMMEyê bi aşkerayî raxist berçavan.

Têkildarî mijarê serokê Giştî yê ÇHDê Murat Yilmaz nirxandin kir û got: ‘Di 2003yan de li DMMEyê der barê mafê heviyê de biryara îhlalê hebû. Piştre di 2014an de biryara Ocalan 2 derket. Piştre der barê Boltan, Kaytan û Gurban de biryar derketin. Diviya bû li gorî xala 90emîn a destûra bingehîn ku biryarên DMMEyê ji bo wê esas in biryar têxistina meriyetê. Lê Tirkiyeyê li dijî vê yekê dîrencê nîşan dide. Divê DMME vê yekê bişopîne. Konseya Ewropa salek berê dîsa kom bûn û salek dan pêş Tirkiyeyê. Dê di rojên pêş de Komîteya Wezîran a Konseya Ewropa dîsa der barê vê mijarê de kom bibin. Em wekî parazvanên mafên mirovan, hiqûqnas û saziyên hiqûqê dibêjin, bi hezaran girtiyên ku cezayê muebeta giran girtine hene. Girtiyên edlî ku 3-4 kes kuştine jî piştî demekê girtî têne ragirtin, serbest têne berdan. Lê girtiyên ku dewlet dibêje sûcê ‘terorê’ û em jî dibêjin ‘siyasî’ yên ku cezayê muebedê xwaribin nayên berdan. Li gorî min li Tirkiyeyê darizandinek bi adîlane tune ye. Em nabin dewleta qanûnê. Di îbareya girtiyên siyasî de dibêjin ‘heta mirinê’ û mafê hêviyê ji destê girtiyan digirin. Ev îşkenceyek veşartî ye. Li gorî xala 3yemîn a DMMEyê ev sûcê îşkenceyê ye. Dibe hûn kesekî bigirin û heta demekê girtî bihêlin. Lê qet nebe, divê ‘Dê çiqasî girtî bimîne’ bê diyarkirin. Divê girtî zanibe dê kengî bê berdan. Sererastkirina înfazê ku wekî girtî qet neyê berdan an jî dê heta mirinê girtî bimîne, ev cureyekî darvekirinê ye. Darvekirina ku li demê hatiye belavkirin e. Cureyekî îşkenceyê ye. Me di civîna xwe de xwest ku dewlet zagonên xwe pêk bîne û li gorî biryara DMMEyê tev bigere. “

Nêzî 4 hezar girtiyên ku cezayê muebat giran girtine hene. Niha girtî tenê nêzî saetekê dikarin derkevin derve. Di rewşeke tecrîda giran de eger girtî wekî ku qet neyên berdan di girtîgehê de bimînin, ev îşkence ye. Ev ne qanûnî ye. Ne li gorî mafên mirovan e.

Em dikarin bibêjin îşkence dewam dike. Hîn girtî nizanin dê serbest bêne berdan an na. Girtî dê çend salan girtî bimîne divê bê zanîn. Ev mafê wî yê hêviyê ye. Divê girtî bibîne ku li derve jiyanek li benda wî heye. Divê heviya wî ya derkeve derve hebe. Eger ji bo vê yekê gav nehatibin avêdin, divê Konseya Ewropa cidî li ser vê yekê raweste. Divê Komara Tirkiyeyê jî li gorî xala 90emîn a Destûra Bingehîn gavan bavêje.

Murat Yilmaz, da zanîn ku eger heta niha Tirkiyeyê gav neavêtibe, ji ber nêzîkatiya îktîdara siyasî û partiyên siyasî ne. Ji ber ev mijar ji ber zêde nabin rojev, Tirkiye ji ber vê yekê gavê navêje. Tirkiye ji ber wekî meseleya terorê lê dinêre, gavan navêje.”

Murat Yilmaz, bal kişand ser girtina 4 hezar girtiyên ku divê ji mafê heviyê sûdê bigere û wiha got: Mesele ne tenê meselya malbatan e. Meseleya civakî ye. Divê civak li dijî vê yekê refleksê nîşan bide û bibêje rawest e. Eger mafê kesekî bê binpêkirin di rastiya xwe de mafê me tevan tê binpêkirin. Mesele kî dibe bila bibe, ji bo her kesî divê mafê hêviyê hebe. Bi taybetî divê partiyên muxalif û civaka muxalîf li dijî vê yekê dengê xwe bilind bike. Mafê Hêviyê mafê mirovan e. Mafê Hêviyê li dijî îşkenceyê ye. Divê her kes li dijî îşkenceyê derkevin û her kes li mafê hêviyê xwedî derkevin. Mafê Hêviyê mafê her kesî ye.”

| Yilmaz Yilmaz

# ZINDANA SERVEKIRÎ: Mexmûr

Hevşaredarê Wargeha Penaberan a Mexmûrê Edban Abdullah Yilmaz anî ziman ku ji 10ê nîsanê ve li ser wargeha mexmûrê ambargo heye û bi polîtîkaya ambargoyê wargeh kirine zindana ser vekirî.

Ji 12ê nîsana 2025an ve li ser Wargeha Mexmûrê ambargo heye. Ji wê demê heta niha ji şêniyên Mexmûrê nikarin bi hêsanî derkevin derveyê wargehê. Nexweş nikaribin biçin nexweşxaneyê. Herî dawî karker hatibûn binçavkirin û berdan.

Hevseroke Şaredariya Wargeha Mexmûrê Edban Abdullah Yilmaz têkildari ambargoya li ser Mexmûrê nirxandin kir û got: “Ji 10ê nîsana 2025an heta niha, ji aliyê hikûmeta Iraqê ve li ser Mexmûrê ambargoyek heye.”

Edban Abdullah Yilmaz anî ziman ku wekî şandeyekê ji Wargeha Şehîd Rustem Cûdî a Mexmûrê, ew wekî hevserokê Şaredariyê û hevalê wan hevserokê Meclisê û nûnerê têkiliyên derve amade bûn û wiha got: “Me xwest bi Wezîrê Dadê yê hikûmeta Iraqê re hevdîtinan çêkin. Me xwest pirsgirêk û ambargoya li ser wargeha Mexmûrê tê sepandin parve bikin. Van pirsgirêkan bi Wazerat Dadê re niqaş bikin. Li ser esasê çareseriya pirsgirêkan em çûn Wezareta Dadê. Me bi Wezîrê Dadê Kak Xalit Şivanî re hevdîtinek kir. Piştî hevdîtinê em binçav kirin û birin cihekî ne diyar. Wekî rêveberên wargehê û berpirsiyarê wargehê em 37 rojan girtî man. Piştî em hatin berdan jî dîsa heta îro ambargoya li ser wargehê berdewan dike. Piraniya şêniyên wargehê debara wan li ser karkirinê ye. Yên ku kar nekin jî birçî dimînin.”

**Şande 37 rojan binçav kirin**

Edban Abdullah Yilmaz, da zanîn ku ji 2019an heta niha ji aliyê hikûmeta herêmê ve ambargoyek li ser wargehê heye û wiha berdewam kir: “Çûyîn û hatina gelê wargehê ya ji bo herêma Kurdistanê hatiye qedexekirin. Ji ber vê qedexeyê gel mecbûr e berê xwe bidin bajarên Iraqê. Gel mecbûre debara xwe bike. Li ser vê yekê me gelek caran hevdîtin kirin û me xwest pirsgirêkên heyî bi rêya diyalogê û rêya hevdîtinan çareser bikin. Lê heta îro dorpêç berdewam dike. Her çend di çûn û hatina karkeran de hin guhertin çêbûbe jî, lê kesên rojane ji wargehê derdikevin, divê navê xwe bi awayekî lîste bidin Lijneya Daîmî ya Iraqê. Bi vî rengî dikarin destûr bigirin û biçin kar. Lê tevî vê yekê gelek caran karkerên me bêsedem têne binçavkirin. Wekî sedem demboriya nasnameyê nîşan didin. Diviya bû 3 sal berê ev nasname bihata nûkirin. Lê nasname nayên nûkirin. Ciwanên me bi rojan û mehan têne binçavkirin. Niha jî kel û pelên bîna û avahîsaziyê ketina wargehê qedexe ye. Destûr nadin ku kel û pelên înşaetê yên wekî çîmento, xîz û blok derbasî nava wargehê bibe. Ji ber dorpêçê xwendekarên me ji perwerdehiya dervê wargehê bêpar in. Ciwanên me ji perwerdehiya Iraqê bêpar in. Heta niha tu alîkarî ji bo perwerdehiya Mexmûrê jî nehatiye kirin. Dîsa di milê tenduristî de jî gelek pirsgirêkên wargehê têne jiyîn.”

**Ambargo bandorê li ser nexweşan dike**


Edban Abdullah Yilmaz da zanîn ku bi sedan welatiyên wargehê bi nexweşiyên kronîk in û wiha lê zêde kir: “Divê ev nexweş biçin bajêr bên dermankirin. Lê ji ber ambargoya li ser wargehê nikarin bi rêk û pêk û bi tendurist biçin derman bibe. Herî dawî 11 karkerên Mexmûrê ku di şîrketeke Iraqê de bi fermî kar dikirin, di serdegirtina şîrketê de ev karker hatin binçavkirin. Bi qasî 18 rojan bê hincet û sedem di bin çavan de hatin girtin. Welatiyên wargehê rojane tên girtin û rojane rastî zextan tên.
Ev qedexe û girtin, şêwazê ambargoya li ser wargehê nîşan dide. Tevî ku em bi her awayî ji qanûn û zagonên Iraqê re rêzê nîşan didin jî, mixabin hikûmet li gorî mafê penaberiyê tev nagere.”

**Ambargo ji 2019an ve didome**

Edban Abudllah Yilmaz, ji 2019an ve Hikûmeta Herêma Kurdistanê ambargoyek daniye ser Mexmûrê û wiha pêde çû: “Ev ambargo raste rast li ser zextên Tirkiyeyê hatiye sepandin. Di vê sedsala ku divê kurd yekîtî û yekrêziya xwe ava bikin de, hînê hikûmeta başûrê Kurdistanê ev ambargoya li ser wargehê berdewam dike. Hîn qedexe ranekirine. Ev cihê rexne û gumanê ye. Divê hikûmeta herêmê bi awayekî qanûnê vê ambargoya li ser wargehê rake. Divê rê li pêşiya wargehê bê vekirin ku karibin nexweşên xwe bibin derve. Dîsa divê ji bo çûn û hatina kar divê derî li wan bê vekirin. Em dixwazin hikûmet dest ji vê ambargoya li ser wargehê berdin. Şêniyên Mexmûrê ji sala 1994an bi awayekî fermî ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve wekî penaber tên qebûlkirin. Bi awayekî siyasî penaberiya welatiyên wargehê divê qebûl bike. Heta îro şêniyên Wargeha Mexmûrê di bin siya Yekîtiya Neteweyî dijîn. Mixabin di salên dawî de piştî êrîşên DAIŞê, NYê erka xwe ya li hemberî wargehê pêk neanî. Bi dehan caran balafirên tirk êrîşî wargehê kirin. Gelek caran zarok û jin bûn qurbana van êrîşan. Heta niha Neteweyên Yekbûyî li dijî vê tu refleks û nerazibûn nîşan nedaye. Herî dawî di 10ê nîsana 2025an de ambargo danîn û nêzî 5 meh in ambargo didome.

**Bang li NYê kir**

Hevseroke Şaredariya Wargeha Mexmûrê Edban Abdullah Yilmaz herî dawî wiha axivî: “En bang li NYê dikin. Em dixwazin erka xwe ya ji bo penaberan pêk bîne. Em dixwazin zextan li aliyan bike ku bi awayekî fermî statuya wargehê bidin pejirandin. Wargeh wekî zindaneke servekirî ye. Di bin dorpêça Hikûmeta Bexdeyê û dorpêça Hikûmata Herêma Federe ya Kurdistanê de ye. Em hevî dikin ku herdu hêz jî dest ji ambargoya li dijî welatiyan terk bike. Bi nêzîkatiya Dewleta Tirk nêzî gelê wargehê dibin. Dewleta Tirk li ser hikûmeta Iraqê û hihekûmeta Herêma ferz dike nêzî Mexmûrê dibin. Bi çavên Dewleta Tirk li geşedanên wargehê dinerin. Em dixwazin dest ji vê helwestê berdin. Em dixwazin şert û mercên wargehê baş bikin û ambargoya li ser wargehê rakin.”



## JIN JIYAN AZADÎ NE TENÊ DIRÛŞM E

# Felsefeya jiyana azad e

■ Xecê Şen

*Di 13ê îlona 2022yan de jina kurd Jîna Emînî ya 22 salî dema li Tahranê bi malbata xwe re bû, bi hinceta ku porê xwe li gor pîvanên rejîmê nenixaftiye ji aliyê 'Polîsên Exleqê' ve hat binçavkirin û rastê tundiyê hat. Jîna Emînî piştî 3 rojan di 16ê îlonê de jiyana xwe ji dest da. Piştî ku Jîna Emînî jiyana xwe ji dest da, di destpêkê da malbata wê tevî zextên dewletê jî dengê xwe bilind kirin. Dengê malbata Jîna Emînî li Goristana Seqizê bi dengê girseyeke mezin re bû yek û li hemû Kurdistan û Îranê belav bû.*

*Dirûşam Jin Jiyan Azadî ya ku li ser gora Jîna Emînî hat berzkirin, bû sembol û serhildana ku destpêkiribû bi vê dirûşmê li hemû cihanê belav bû.*

*Rejîma Îranê ji bo van çalakiyan bi dawî bike, çalakger raste rast hedef girt û gelek ciwanan qetil kir. Her kuştina ku çêdibû hêrsa li dijî rejîmê zêde dikir û ev hers li hemû bajaran belav dikir. Her ku serhildan belav dibû tundiya ku rejîmê dikir jî zêdetir dibû.*

*Di serhildana Jin Jiyan Azadî de herî kêm 537 kes hatin qetilkirin (IHR). Tenê di 30yê îlona 2022yan de li Zahedanê 104 kes hatin kuştin. Bi hezaran kes ji ber êrîşa rejîmê birîndar bûn. Bi taybet jî rejîmê çavên çalakgeran hedef digirt û wisa êrîş dikir.*

*Rejîma Îranê herî kêm 20 hezar kesên ku di nav çalakiyan de girt, şand girtîgehan. Di vê pêvajoyê de ji hezaran kesan agahî nedihat girtin. Rejîma ku çalakger avêt girtîgehan, bi demê re cezayê darvekirinê da wan. Hinceta darvekirina wan jî wek 'Li dijî Xwedê şer dikin' dihat nîşandan.*

*Tevî bedelên ku hatine dayîn jî bi Serhildana Jin Jiyan Azadî re hevgirtineke xurt di nav gelan de pêk hat. Hemû jinên cihanê li dora dirûşma Jin Jiyan Azadî kom bûn. Di vê qadê de nirxandin û parvekirinên girîng çêbûn.*

*Em der barê Serhildana Jin Jiyan Azadî û têkiliya wê ya bi Jineolojiyê re bi endama Lijneya Weşanê ya Kovara Jineolojiyê Ayşe Ayaz re axivîn.*



Endama Lijneya Weşanê ya Kovara Jineolojiyê Ayşe Ayaz der barê dirûşma Jin Jiyan Azadî de got: "Dema em behsa dirûşmeya Jin Jiyan Azadî dikin divê were zanîn ku ev ne tenê dirûşmeyek ji rêzê ye. Rastiyekî dîrokî û sosyolojîk di nav xwe de dihewîne. Jin jiyan e û divê jiyan were azadkirin. Ev bi xwe felsefeya jiyana azad e. Jinên kurd bi vê felsefeye mohra xwe li tekoşîna vê sedsalê xistine."

***Di 16ê îlona 2022yan de Jîna Emînî li Îranê hat kuştin û di kesayeta wê de serhildana Jin Jiyan Azadî dest pê kir. Hûn vê serhildanê çawa dinirxînin?***

Di serî de ez di şexsê Jîna Emînî de hemû jinên ku ji aliyê mêrê serdest ve hatine kuştin bibîr tînim. Ew ji bo me bangawaziya bilindkirina tekoşîna azadiya jinan e. Her jina ku tê kuştin hêrsa me jî biryardariya me ya guherandina vê pergala riziyayî jî mezintir dike.

Axa Rojhilata Navîn di dîrokê de gelek raperînan re bûye şahîd, em di vê hêlê de xwedî dîrokek dewlemend in. Yek ji van serhildanan jî serhildana Jin Jiyan Azadî ye. Em di çend xalan de dikarin vê raperînê binirxînin. Ji ber ku ev pevajo di tekoşîna azadkirina gelên Rojhilata Navîn û jinan de cîhê xwe yê taybet girtiye. Jîna Emînî jinek kurd bû û ji ber porê xwe negirtibû ji aliyê pergala Îranê ve hat kuştin. Ev ne bûyerek ji rêzê ye. Di hundirê xwe de nêrîna pergalê ya li dijî jinan çi ye? Û ev pergal xwedî dîrokek çawa ye dihewîne. Desthilatdarî her tiştên jinan wek guneh digire dest, ji bo wan dengê jinan, bedena jinan, nêrîna jinan heram e, an jî qirêj e. Di 16ê îlona 2022yan de jî ev nêrîna tarî di şexsê Jîna Emînî de rastiya xwe derxist holê. Li hember vê jî di serî de jinên Kurdistanê, li gelek deverên cîhanê jinan hêrs û berteka xwe ya dîrokî bi vê raperînê nîşan dan. Li hember êrîşa sîstematîk a pergalê, di pêşengiya jinan de gelên azadîxwaz bi berxwedana xwe karakterê vê pergalê carek din deşifre kirin û rûhê azad nîşanê cîhanê dan. Yanî ev raperîn ne tenê raperîneke demkî bû, me dît ku karakterê wê axê paşverûtî û bindestiyê napejirîne. Ev xalekî giring e.

***Li hemû cîhanê sedsala 21emîn wek sedsala azadiya jinan tê pênasekirin. Lê di vê sedsalê de jinên kurd bi zanebûn hedef tên girtin. Hûn vê rewşê çawa dinirxînin?***

Wek Tevgera Azadiya Jinan angaştekî me heye; em dibêjin sedsala 21emîn wê bibe sedsala jinan. Em dikarin bêjin ku ev raperîn rastiya vê angaştê derxistiye holê. Îro pergala moderniteya kapîtalîst bi her alî ve ketiye xeta hilweşandinê. Krîzên demkî û demdirejî yên ku berdewam dikin hewl tê dayîn ku bi rêbazên cur be cur werin derbaskirin. Lê nakokiya bingehîn ku di aliyê cinsî de ye her ku diçe kûrtir dibe. Her pergal polîtîkayên xwe li ser tepisandina vîna azad a jinan ava dike. Li hember vê li her derê cîhanê tevgerên jinan di nav berxwedanê de ne. Karakterên dewletan çiqas cuda bin jî em dibinin di mijara azadiya jinan de hemû di heman polîtîkayan de israr dikin. Ji Afganistanê heta Amerika, ji Îranê heta Hindistanê pergal bi yek rengî tevdigere. Li hember vê rastiyê me raperîna Jin Jiyan Azadî de dît ku êdi jinên cîhanê jî xwedî hişmendiya tekoşîna yekbûyî ne. Her çiqas ev bûyer li Rojhilatê Kurdistanê pêşketibe jî jin êdi dizanin ger koletî di cîhanê de yekser be divê azadiya cinsî jî ne axekî re girêdayî be. Heta nakokiya dîrokî ya cinsî çareser nebe azadiya gelan jî baweriyan jî pêk nayê. Ji ber vê di van serhildanan de hemû beşên azadîxwaz di pêşengtiya jinan de cîhê xwe girtin. Ev hêviyên me jî baweriyên me jî bilindtir dike.

Dîsa wek tê zanîn pergala Îranê ne pergalekî ji rêzê ye. Polîtîkayên ku li Îranê pêş dikeve bandora xwe li Rojhilata Navîn tevahî dike. Piştî 1979an ku rejîma îslamî bû desthilat ji bo avakirina hegemonyaya xwe pêkanînên gelek qirêj pêş xist. Rejîmê xwest tirsê ava bike. Rejîma Îranê rejîmek ku bi destê melayan hebûn û vîna jinan, gelan, baweriyan ditepisîne. Li hember ewqas hewldanên der însanî me di van raperînan de careke din dît ku ew ruhê azad ya jin û gelên Îranê winda nebûye û tu pergal jî nikare vê ruhê bitepisîne. Ev rastî ji bo pêşeroja Rojhilata Navîn jî ristekî mezin lîst û ev bandor îro jî derbasdar e. Ji ber ku îro çarenûsa moderniteya kapîtalîst li Rojhilata Navîn diyar bibe, Îran jî di vê pêvajoyê de hêz û roleke mezin dilîze. Ji bo vê em dikarin bêjin ku ev ne tenê raperînek hundirin an jî demkî bû. Koka xwe ji dîrokê girtibû û diyar dike ku dê di pêşerojê de jî rista xwe bilîze.

***Li gor nêrîna te serhildanê çima navê xwe ji dirûşma Jin Jiyan Azadî girt û di pêşxistina vê serhildanê de rola Jineolojiyê çi ye û bandoreke çawa li ser serhildanê kir?***

Bûyerên ku îro diqewimin em nikarin tenê bi roja xwe ve giredayî binirxînin. Li ser vê axê rastiya Tevgera Azadiya Jinam heye, çanda berxwedanê heye. Ev tevger koka xwe ji berxwedana xwedawendî digre heta roja me bi berdel û tekoşînek giranbuha xwe mezin dike. Tekoşîna azadiya jinên kurd di sosyolojiya heremê de gelek guhertinên mezin çêkir. Hewl da ku di her qada jiyanê de sekna serbixwe û azad biafirîne. Ev rastî di 50 salên dawî de hemû guhertinan de ristekî mezin lîst, ev nikare were înkarkirin. Di rastiya civakan de li hember koletî û bindestiyê her tim nepejirandin heye.

Vê seknê birexistinkirin, hêza guhertinê ava kirin û avakirina rista pêşengtiyê bi tekoşîna jinên kurd ve giredayî ye. Ji ber vê dema em behsa dirûşmeya Jin Jiyan Azadî dikin divê were zanîn ku ev ne tenê dirûşmeyeke ji rêzê ye. Rastiyekî dîrokî û sosyolojîk di nav xwe de dihewîne. Jin jiyan e û divê jiyan were azadkirin. Ev bi xwe felsefeya jiyana azad e. Jinên kurd bi vê felsefeye mohra xwe li tekoşîna vê sedsalê xistine. Ji ber vê jî ev dirûşm êdî ne tenê ji bo jinên kurd ji bo hemû tevgerên femînîst û azadiya jinan wek dirûşmeyekî bingehîn e. Di vê serhildanê de jî rola jinên kurd nîşan da.

Dîsa dema em behsa azadiyê dikin, hewce dike ku em heyîna jinan bi her alî ve bigrin dest. Li holê sosyolojiyêk çewt heye, penaseyên derew hene, dîrokekî hatiye berovajîkirin heye. Em heta van şaşîtiyan rast nekin û li gor heqîqeta jin û civakê penase nekin, em nikarin behsa azadiyê jî bikin. Yanî divê di destpekê de xwenasîn hebe. Ev jî bi rêya zanistê mîsoger dibe, yan jî bi Jineolojiyê ve girêdayî ye. Li dijî koletiyê serîhildan û avakirina pevajoya divê. Xwenaskirin û zanîna şer a li dijî hêza ku te tune dike, pêş dikeve û bi vê re jî xwe înşa destpêdike. Em di vê serhildanê de jî ve herikbariyê dibinin û dikarin bêjin ku Jineolojî di vê herikandinê de rolek girîng dilîze.

***Serhildana Jin Jiyan Azadî ya li Rojhilat belavê hemû cihanê bû, bandoreke çawa li ser Bakur kir?***

Me li jorê behsa yekîtiya tekoşîna jinan kir. Di nav vê de li her parçeyên Kurdistanê xwedî karakterekî resen e. Li Bakur Tevgera Jinên Azad (TJA) û gelek saziyên jinan hene. Em dikarin bêjin hêza herî dînamîk a tekoşîna azadiyê ne. Îro li Tirkiyeyê jî hewl tê dayîn ku rejîmek teokratîk were sazkirin. Hemû polîtîka li ser hebûn û bedena jinan tên meşandin.

Dixwazin jinan ji xeta azadiyê dûr bixin û di nav malê de bifetisînin. Yanî em dikarin bêjin pekanînên rejîma Îranê û Tirkiyeyê ji gelek hêlan ve dişibin hev. Li hember vê jî ji her deme zedetir hewcedarî bi tekoşînek hevpar heye. Bi vê raperînê ev hewcedarî him zêdetir hat dîtin him jî derfetên tekoşîna hevpar zêdetir kir. Ger îro em behsa Konfederalîzma jinan û xebatên vê pergalê bikin, raperîna Jin Jiyan Azadî jî di vê rêyê de ristek mezin lîstiye. Aliyêkî din jî bê guman yekîtiya neteweyî ya gele kurdan e û di vê mijarê de jî rola jinan carek din diyarde dibe. Rojhilatê Kurdistanê ev 500 sal zêdetir e ji Kurdistanê hatiye qutkirin. Bi vê ve giredayî gelek polîtîkayên pişaftinê pêş ketine. Lê em di dawî de dinêrin ku ev ruhê yekîtiyê di şexsê jinên kurd de nehatiye tepisandin û windakirin. Ev nîşanyek pir girîng e.

Sînorên ku dewletan ji bo perçebûnê xêzkirine, li dijî têkoşîna jinan tu wateya xwe tûne ye. Divê em vê rastiyê jî ji rêzê nebînin. Ji ber vê rastiyê jî raperîna Rojhilat ji bo Bakur jî, ji bo Başur û Rojava jî rolekî pir mezin lîst. Tevgerên jinan carek din zindî kir. Ruhê yekîtiyê bilind kir, di hebûna neteweyî ya gelê kurd de, karaktera jina azad derxist holê.

# Em perwerdehiya bi kurdî dixwazin

Mûsa Şanak

**Behsa diyalog û çareseriyeke demokratîk; behsa xwe guherandin û guhertinê tê kirin. Lê ji xêncî gotinê ji eniya dewlet û desthilatdariyê kirineke erênî ya wiha berbiçav a ku dê baweriyê bide civakê xuya nake**

Wa ye dîsa vebûn bi sed hezaran dibistanên li Tirkiye û Kurdistanê. Dîsa dest bi perwerdehiya bi tirkî kirin di her astê de, ji pêşdibistanê bigir heta zanîngehê. Dîsa bêpar man zarok û ciwanên kurdan ji perwerdehiya bi kurdî.

Ji sed salî zêdetir e ku em kurd bi polîtîkayên mêtingeriyê yên wekî înkar û tunehesibandinê re rû bi rû ne. Ziman, çand û nasnameya me tûne tên hesibandin û tên qedexekirin. Wekî civak û netewe me ev yek qebûl nekiriye û ji Serhildana Koçgiriyê bigire heta îro me bi dehan caran îtiraz kiriye û serî rakiriye. Pergala mêtinger li şûna ku dev ji neheqiya xwe berde zilim li me kiriye, em kuştine, gundên me şewitandine û em mişext kirine. Her ku me serî hildaye û dewa heqê xwe kiriye wan zilim û hovîtiya xwe zêdetir kiriye.

Têkoşîna Tevgera Azadiyê ya di nava van pêncî salên dawîn de jî berdewamî û lûtkeya wan serhildan û berxwedanên berê ye. Bi saya vê têkoşînê kurdan hebûn û nasnameya xwe dost û dijmin bi her kesî da qebûlkirin. Digel vê yekê jî pergala mêtinger hê dev ji qedexe û înkarkirinê bernedaye.

Îro ro behsa pêvajoyekê tê kirin. Hewldana vekirina rêyeke aştiyane heye. Behsa diyalog û çareseriyeke demokratîk; behsa xwe guherandin û veguherandinê tê kirin. Lê ji xêncî gotinê ji eniya dewlet û desthilatdariyê kirineke erênî ya wiha berbiçav a ku dê baweriyê bide civakê xuya nake.

Gelo ev tê çi wateyê? Divê em çi navî li vê durûtiyê bikin? Mebesta wan çi ye? Çima her carê xwe li hincetekê digirin?

Karê herî hêsan afirandina hincetan e. Heke dewlet û desthilatdariyê di derbarê çareserkirina pirsgireka kurdan de biryareke stratejîk bida, dê ji bo bipêşxistina pêvajoyê rojê sed hincet peyda bikira û gorî wê jî gav biavêta. Nexwê pergala mêtinger hîn bi awayekî taktîk nêzî vê meseleyê dibe û xwe dixapîne. Pê re hewl dide ku civakê jî bixapîne.

Gelo dê bikare Rêzdar Ocalan bixapîne? Dê bikare Tevgera Azadiyê bixapîne? Dê bikare civaka kurd bixapîne?

Dibe ku xwe bixapîne, lê ne pêkan e ku bikare Rêzdar Ocalan û Tevgerê û civaka kurd bixapîne. Kurd êdî ne kurdên berê ne. Rast e, hê gelek kêmasî û qelsiyên xwe hene. Lê gîhiştiye asteke wisa ku êdî bi hêsanî ji hev derdixîne ku ka ji bo wî çi bi xêr e û çi jî şer e.

Qelsiya me kurdan a herî mezin, a ku me bi xetereyan re rû bi rû dihêle jî nêzikatiya me ya li hemberî çand û zimanê me yê neteweyî ye. Bi minasebeta 21ê Sibatê lêkolînek hatibû çêkirin. Di encamê de derketibû holê ku rêjeya wan zarokên ji 10 salî biçûktir ên ku di malê de hînî kurdî dibin û diaxivin daketiye ji sedî 8an. Ev nîşaneya xetereyeke mezin e. Piraniya ciwanên Bakur bi zimanê xwe nizanin. Yên ku dizanin jî bi piranî pir kêm dizanin û bi tirkî diaxivin. Ciwanên ku pêşengiya têkoşînê dikin bi tirkî diaxivin û dijîn. Hema hema du nifşên dawîn ên civaka me ji çand û ziman û nasnameya xwe ya neteweyî bi dûr ketine. Rewşa jinên ciwan jî wisa ye. Rêveberiyên Herêmî li hin cîhan ji bo dayîk û jinên kurd ên ku bi tirkî nizanin kursên xwendin û nivîsandinê yên bi tirkî vedike. Lê di vekirina kursên kurdî de ewqas ne heweskar in.

***Jin û ciwan pêşeng in. Ku pêşengên me wiha bin, dê halê me çawa be?***

Çendek berê jî lêkolînek hatibû çêkirin û li gorî encamên wê jî rêjeya wan kesên ku perwerdehiya bi kurdî dixwazin ji sedî 97,79 e. Em bibêjin ji sedî 98 kes perwerdehiya bi kurdî dixwazin. Ev rêjeyeke pir bilind e ku divê mirov pê kêfxweş bibe.

Îro yên ku têkoşîna zimên didin komeke biçûk a dildaran e. Ew di vê oxirê de her tiştî hildidin ber çavan û xwe seferber dikin. Hewl didin ku sazîbûn û rêxistiniya xwe xurttir bikin û hişmendiyekê ava bikin di nava civakê de. Mixabin di gel bêderfetî û gelek dijwariyan têdikoşin.

Gelo têkoşîna zimên tenê karê sazî û dildarên zimên e? Çima hemû qad û saziyên me xwe wek parçeyekî vê nabînin? Çima zimên wek rojeveke xwe ya bingehîn û sereke qebûl nakin û xebatên xwe li ser vî esasî nameşînin? Çima her qadeke me di vî warî de stratejî û bernameyeke xweser ava nekiriye û budçeyek veneqetandiye?

Zimanê kurdî-kurmancî û kirmanckî/zazakî- zû yan dereng dê bibe zimanê perwerdehiyê. Dê ji pêşdibistanê bigire heta zanîngehê di her astê de bi kurdî perwerde were dayîn. Dê têkoşîna me bi ser bikeve û rojek bê bi dawî bibe ev zilm û neheqiya heyî. Gelo em çiqas amade ne?

Heke sibe ev yek pêk bê em çiqas amade ne? Ji bo vê me sîstem û stratejiyek diyar kiriye? Me mamosteyên xwe gihandine? Me çavkaniyên xwe amade kirine? Mixabin na!

***Gelo ev yek tenê peywira saziyên zimên e?***

Bi minasebeta vebûna dibistanan saziyên zimên hewl dan ku balê bikişînin ser vê neheqî û zilma ku bi dehan sal e didome û bi şiara "EM PERWERDEHIYA BI KURDÎ DIXWAZIN / EM PERWERDEYÊ BI KURDKÎ WAZENÊ" çalakî û meş li dar xistin û daxuyanî dan. Ji kerema xwe re li dîmenên ku derketine holê binêrin û rewşê binirxînin.

Ka di kîjan çalakî û daxuyaniyê de çend hevserok û wekîl, çend hevşaredar û endamên meclîsên şaredariyan, çend hevserokên navçe û bajaran hene. Ka çend rêveber û endamên qad û saziyên me yên cur bi cur hene. Gelo ew li ku ne? Çi xebatê dikin, di kîjan civînan de ne? Ka ziman di rojeva wan de heye; yan na?

***Heke ziman îro jî ne di rojeva wan de be, dê kengê hebe?***

Rêjeya kesên ku perwerdehiya bi kurdî dixwazin ji sedî 98 e. Ka ew li ku ne? Çima ji bo vê daxwaza xwe tênakoşin? Ma tenê xwestin bes e? Ev xwestek çima tenê di gotinê de dimîne? Ma bêyî têkoşîn heta niha tiştek hatiye bidestxistin?

Em dixwazin ku rewşa heyî xal bi xal bi awayekî bêhtir zelal raxin ber çavan û balê bikişînin ser çend tiştên ku divê bên kirin.

***1-*** Divê em demildest dest bi amadekariyên perwerdehiya bi kurdî bikin. Divê ev bi tevlibûneke gelemperî pêk bê. Bi taybetî jî avakirina derfetan, birêxistinkirin û kordînekirina wê. Ji bo vê divê komxebat û konferans bên lidarxistin. Meclîsa Zîmên bi vê mebestê dê li Wan, Amed û Stenbolê komxebat û konferansan çêbike.

Li Rojava ji deh salan zêdetir e ku perwerdehiya bi kurdî tê dayîn û tecrubeyek çêbûye. Li Başûr û Mexmûrê jî tecrubeyek heye. Li Qafqasyayê û hin welatên Ewropayê jî heye. Ev mekanîzmayek bê avakirin ku bikare van tecrubeyên cuda bike yek û ji bo Bakur pergal û stratejiyeke perwerdehiya bi kurdî ya guncav ava bike. Di serdema Kurdî-Derê de hewldaneke baş çêbûye, lê bi ser neketiye. Dersên ku ji vê hewldanê werin derxistin hene. Divê sûd ji wê keda hatî dayîn bê wergirtin û ew bê parastin.

***2-*** Divê em ji avahiyan derkevin û xwe bigihînin civakê. Demeke ku me xwe bi avahiyan sînordar kiriye. Em li bendê ne ku gel bê saziyan. Gel û sazî ji hev qetiyane. Yên ku bi israr tên saziyan û diçin kêm bûne. Ji bo berfirehtir û civakîkirina têkoşîna zimên, lazim e ku em ji avahiyan derkevin û biçin taxan. Di nava gel de li taxan înîsîyatîf û komunên zimên û komên xwendina pirtûkên kurdî ava bikin. Li taxan her cîhekî bikin kurdîgeh. Lazim e ku her kurd xwe wek aktîvîst û têkoşereke/î kurdî bibîne û têkoşînê di xwe de bide destpêkirin û ji xwe, ji malbata xwe ber bi gund/ tax û bajarê xwe ve berfireh bike.

***3-*** Sazîbûna me qels e. Me xwe negîhandiye hemû navçe û bajaran. Divê em qelsiya xwe ji navê rakin û li her derê sazîbûna xwe ava bikin. Em bi navendên bajar û navçeyan ve bi sînor mane. Divê em gundan ji bîr nekin û wan jî bikin qada xebat û têkoşîna xwe.

***4-*** Xebatên ku xîtabê zarokan dikin û çand û zimanê kurdî bi wan didin hezkirin jî pir kêm in. Divê em li her derê zarokîstanan vekin û xebatên ji bo zarokan bikin bingeha hemû xebatên xwe.

***5-*** Kordînasyon, hevtemamkirin û hevxurtkirina saziyên ku di vî warî de xebatê dimeşînin pir qels e. Pirserîtî û belawelatiyek heye. Divê ev bê sererastkirin.

***6-*** Wek du qadên cuda pênase û birêxistinkirina qadên zimên û çandê, nêzikatiyeke bi pirsgirêk e. Encamên vê yekê hêjayî nirxandineke kûr û berfireh e. Xuya ye ku tiştê ku jê hatiye mebestkirin pêk nehatiye. Em dikarin bibêjin ku vê nêzikatiyê bandoreke neyînî li xebatên her du qadan jî kiriye.

***7-*** Xebatên me bi giranî kurmancî ne. Lazim e ku em giraniyê bidin xebatên kirmanckî/zazakî. Hewldan û daxwaza me ya bipêşxistina xebatên kirmanckî hebe jî ev ne bes e. Em bi biryar in ku xebatên xwe li Bakûr bi du zaravayan bimeşînin û vê wek hişmendiyekê bi civakê jî bidin qebûlkirin. Em dikarin bibêjin ku ev qebûl heta astekê pêk hatiye. Lê ne bes e.

***8-*** Xebatên me bi gelemperî bi cejn û rojên taybet ên girîng ve bi sînor in. Hewce bi xurt û domdarkirinê heye.


***9-*** Di navbera saziyên zimên û enstîtûyên kurd ên li Ewropayê, saziyên zimên û SZKya Rojava de jî têkiliyeke baş nehatiye avakirin. Kes û saziyên cuda bi serê xwe hin têkilî bi wan re danîbin jî ew ne têkiliyên rêxistinî ne. Ev yek jî rê li ber pirsgirêk û tevliheviyan vedike. Divê di navbera qad û saziyên zimên ên Bakur û yên Rojava, yên Bakur û yên Ewropayê de têkiliyên xurt ên bi rêxistinî bên avakirin.

Bi derengî be jî divê gavên pêwîst bên avêtin. Ev qad jî valahiyê qebûl nake. Di her valahiyekê de hêz û saziyên cuda derketine holê. Îro em dibînin ku gelek kes û derdorên qedirnezan hewl didin xwe li ser nirxên me bidin jiyandin. Heta em karê xwe baş nekin, bi rêxistinî û bi disiplînî nexebitin û wê valahiya ku ji kêmasiyên me avzê bûyî ji navê ranekin, dê ev îstîsmar bidome. Lazim e ku em bi vê bîr û baweriyê xwe sererast bikin û têkoşîna xwe xurttir bikin.

*#zarokzimanazadî*
*#statuyakurdîperwerdehiyabikurdî*




# Daxwaza perwerdehiya kurdî



Arslan Ozdemir

*"Divê zimanek pêşî bijî da ku bikaribe were axaftin; divê were axaftin da ku bikaribe were xwendin; divê were xwendin da ku bikaribe hebûna xwe ber bi pêşerojê ve bibe."*

Di anketekê de ku li 23 bajaran, tevî Amed û parêzgehên derdorê, hat kirin, ji sedî 97.79ê beşdaran diyar kirin ku ew dixwazin zimanê kurdî di hemî astên perwerdehiyê de bibe zimanê perwerdeyê. Ev rêje daxwaza xurt a raya giştî ji bo perwerdehiya kurdî nîşan dide. Lê belê, hin derdor nerazîbûna jêrîn radikin: "Ew perwerdehiya kurdî dixwazin, lê ew bi kurdî naaxivin û naxwînin. Pêşî, divê ew biaxivin û bixwînin."

Ev nêzikatî di nêrîna pêşîn de dibe ku mantiqî xuya bike, ji ber ku divê ziman ji bo mayîndebûna xwe were axaftin û nivîsandin. Lê ji hêla sosyolojîk ve, pirsgirêk pir kûrtir e.

Nebûna zimanê kurdî di jiyana rojane de ne encama hilbijartinên takekesî ye, lê belê polîtîkayeke demdirêj a asîmîlasyonê ye. Heta serdemek hebû ku fêrkirina zimanê kurdî li malê ji zarokan re "qedexe" bû. Salên ku xwendekarên ku li dibistanan bi kurdî diaxivîn dihatin cezakirin hîn jî di bîra civakê de teze ne. Di bin van şert û mercan de, beşeke mezin ji kurdan neçar man ku ji axaftin û veguhestina zimanê xwe yê zikmakî dûr bisekinin.

Ji ber vê yekê, ew rastiya ku hin kurd îro bi kurdî nizanin ne ji ber ku pêwîstiya wan bi kurdî tune ye, lê ji ber ku ew ji ber polîtîkayên zordar ên dewletê nikarîbûn bi kurdî biaxivin e. Gotina "Bila pêşî biaxivin û bixwînin" di rastiyê de tê wateya ku mafê perwerdeyê wekî şertek were hesibandin. Lê belê, perwerde ji bo gelek kesan mafê herî bingehîn e ku zimanê xwe biparêzin, pêş bixin û bidin nifşên pêşerojê. Kêmbûna bikaranîna zimanekî di jiyana rojane de nayê wê wateyê ku hewcedariya wî zimanî ji holê rabûye; ew pir caran encama dûrxistina wî ji jiyana giştî bi rêya zordarî û qedexeyên sîstematîk e. Di vê noxteyê de, perwerde ji bo ku ziman dîsa xuya bibe û fonksiyonel bibe girîng e. Kirina zimanê kurdî wekî zimanê perwerdeyê ne tenê daxwazek e; ew di heman demê de hawîrdoreke pêwîst ji bo ku mirov zimanê xwe yê dayikê fêr bibin, bixwînin û binivîsin, û bi azadî nasnameyên xwe yên çandî biceribînin biafirîne. Dibistan ne tenê saziyek e ku zanîna akademîk vediguhezîne; ew di heman demê de ji bo standardkirina ziman, pêşxistina çanda nivîskî, û xurtkirina bîra civakî saziya herî girîng e. Kirina zimanê dayikê wekî zimanê perwerdeyê di dibistanan de dibe alîkar ku kes di jiyana rojane de bi hêsanî bi ziman biaxivin, jêhatiyên xwendin û nivîsandinê pêş bixin, û ziman di jiyana civakî de bi bandortir bikar bînin. Ji ber vê yekê, pratîka axaftin û xwendinê dê ne bi mantiqa "eger pêşî were, perwerde dê pêşî were" lê bi saya perwerdeyê bi xwe pêş bikeve, xurt bibe û mayînde bibe.

Bi gotineke din, rêbaza "pêşî biaxive, paşê perwerde bike" mantiqeke şaş e; berevajî vê, heke perwerde bê dayîn, axaftin û xwendin dê baştir bibin.

Daxwaza piraniya mezin a kurdan ji bo perwerdehiya bi zimanê kurdî nerehetiya wan ji rewşa heyî û pabendbûna wan bi zimanê xwe yê zikmakî nîşan dide. Rêjeya nizm a axaftina bi kurdî daxwazê qels nake; berevajî vê, ew lezgîniya mafê perwerdehiyê nîşan dide. Ev jî ber ku mirov dixwazin bi rêya perwerdehiya saziyî zimanekî ku bi tunebûnê re rû bi rû ye vejînin.

Bêguman, pêşeroja zimanê kurdî ne tenê bi rêya "perwerdehiya fermî" mimkun e, lê di heman demê de bi rêya bikaranîna wê di jiyana rojane de jî mimkun e. Pêdivî ye ku bikaranîna zimanê kurdî li malê, li kolanê, li kar, di medyayê de û bi awayekî dîjîtal zêde bibe. Lêbelê, mekanîzmaya herî bihêz ku dê piştgiriyê bide vê pêvajoyê, zimanê perwerdehiyê li dibistanan e.

Îdîaya ku "ew perwerdehiya bi zimanê kurdî dixwazin, lê ew ne diaxivin û ne jî dixwînin" perspektîfek rûberî ye. Pirsa rastî ev e: Gelo sîstemek ku derfeta axaftin û nivîsandina zimanê zikmakî ji mirovan re înkar dike, dê îro jî vê derfetê sînordar bike, an dê gavan bavêje da ku daxwazên civakê bicîh bîne û ziman zindî bihêle?

Daxwaza perwerdehiya bi kurdî bi hinceta ku axaftin û xwendinê derbas dike nayê paşxistin. Berovajî vê, heke mafê perwerdehiyê were dayîn, axaftin û xwendin dê pêş bikeve, û kurdî dê di jiyana takekesî û civakî de hebûnek xurttir hebe.



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Civak li benda hêviyê ye

Mafê Hêviyê ne tenê ji bo Rêber Apo, ji bo demokrasiya Tirkiyeyê û aştiya Rojhilata Navîn, pêdiviyeke girîng e. Ger ev maf were naskirin, wê li Tirkiyeyê jî hêviya azadiya mezin bibe û modelek nû bi xwe re bide afirandin



“Mafê Hêviyê” ango (right to hope), li gorî hiqûqa navneteweyî, mafek e ku girtiyên cezayê zindanîbûna demdirêj bi taybetî zindanîbûna muebetê li wan hatiye birîn, heq dide ku rewşa wan piştî demeke diyarkirî were nirxandin û ji bo berdana wan derfetan ava dike.

Ev maf ji hêla Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) ve di sala 2013an de di biryara xwe ya “Vinter and Others v. UK” de hatiye destnîşankirin, ku dibêje cezayê zindanîbûna têkoşîna li dijî xala 3yan a Konvensiyona Ewropayê ya Mafên Mirovan (qedexekirina îşkence û muameleya neinsanî) ye. Li gorî zanistiyên hiqûqê, ev maf bingeha mafê bingehîn e, ji ber ku ew hêviya guhertinê û vegerandina civakê dide girtiyan û bi vê prensîba “rehabilitasyonê” ve girêdayî ye.

DMMEê di 18ê adarê 2014an de ji bo Rêber Abdullah Ocalan biryar da. Diyar kir ku cezayê wî yê zindanîbûna giran, ne li gorî “Mafê Hêviyê” ye û li dijî xala 3yan e. Dadgehê daxwaz ji Tirkiyeyê kir ku qanûnên xwe biguherîne da ku maf bide girtiyên ku piştî 25 an jî 30 salan rewşa wan were destgirtin. Lê belê, Tirkiye heta niha bersiv nedaye vê biryarê. Dewleta tirk vê gavneavêtina xwe jî di 27ê hezîrana 2025an de bi îdîaya “Mafê Hêviyê ji bo sûcên terorê nayê dayîn” parast. Bê gûma ev helwesta Tirkiyeyê li dijî biryara DMMEyê ye ku dibêje ne tenê ji bo Rêber Apo, divê hemû girtiyên zêdetirî 25 salin li girtîgehê ne ji vî mafî sûdê bigrin.

Mafê hêviyê di qanûna navneteweyî de, bi taybetî di çarçoveya Konvensiyona Ewropayê ya Mafên Mirovan de tê destnîşankirin. Ev maf dibêje ku her kesê/a ku cezayekî dirêj digire, divê hêviyek rastîn hebe ku di pêşerojê de azad bibe. Ev maf bi awayekî mirovî û bi rêya qanûnî jî hatiye destnîşankirin.

“Mafê Hêviyê” di hiqûqa navneteweyî de ji hêla DMMEyê ve hatiye pêşxistin. Di bingeha vê biryarê de mafên mirovan ên bingehîn hene. Her wiha ev maf di çarçoveya Lêkolînên Huqûqa Mafên Mirovan de, di xalên 3 û 5an yên Konvensiyona Ewropayê de tê dîtin û ew bi “Hêviya Guhertinê” ve girêdayî ye.

Li gorî qanûnên mafên mirovan ên DMMEyê, rewşa zîndankirina Rêber Apo nîşan didin ku nedanîna mafê, wekî îşkenceyê tê dîtin û Tirkiye ne li gorî biryarê tevdigre. Zanistên wekî Jarrod Hepburn ku di qada pêkanîna hiqûqa navneteweyî de pispore, dibêjin ku ne li gorî biryarê tevgerandin dibe sedema “Lêpirsînên Binpêkirinê” ji hêla Komîteya Wezîran ve. Niha di çarçoveya nîqaş û qanûnên hayî de Komîteya Wezîran, ku pêbaweriya bi biryarên DMMEyê dike, di civînên xwe yên 2024 û 2025an de hişyarî da Tirkiyeyê ku ger gavên erênî neavêje, wê “Prosedura Binpêkirinê” dest pê bike. Di rapora Komîtê ku di civîna 17-19ê îlona 2024an de dide nişan ku biryar divê heta îlona 2025an derkeve û ev dema dawî ya Tirkiyeyê ye ku guhertina qanûnî bike. Lê belê, Tirkiyeyê bi hinceta “Sûcên terorê di vê kategoriyê de nayên destgirtin” ev red kir. Lê DMMEyê di çarçoveya doza Rêber Apo ya “Ocalan 2” de got ku cezayê giran ên heta hatayê “Li dijî qedexekirina îşkenceyê” ye.

Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê wê 15-17ê îlona 2025an de, li bajarê Strasbour a Fransayê li hev bicive. Yek ji rojava civînê jî rewşa Rêber Apo û dema ji Dewleta Tirk re diyar kiriye. Tê payin ku ger di vê mijarê de Dewleta Tirk biryara xwe neguhere, Komîteya Wezîran dikare “Biryarên Navbeyn” bigire.

Lê Tirkiyeyê di halê heyî de qanûnên xwe yên 5275 (Qanûna Cezaya Zindanîbûnê) hîn neguhertiye. Li ser vê Wezîrê Edaletê Yilmaz Tunç di adarê 2025an de gotibû ku “Mafê hêviyê di qanûna me de tune ye”. Ev, li gorî qanûnê sedema “Binpêkirina Hiqûqî” ye û Komîteya Wezîran wê daxwaz ji Tirkiyeyê bike ku guhertinê bike.

Di çarçoveya biryara DMMEyê de Komîteya Wezîran ji sala 2014an û vir ve gelek caran hişyarî da Tirkiyeyê. Lê ji ber sedemên siyasî ji bo pêkanîna vê biryarê zextên xurt nehatine kirin.

Komîteya Wezîran pêbaweriya bi biryarên DMMEyê dike, lê ew ne dadgeh e; ew tenê “Pêşniyaz” dike. Komîteya Wezîran di sala 2024an de “Demeke Dawî” da. Eger gavên pêwîst neyên avêtin wê prosedura binpêkirinê dest pê bike. Eger Dewleta Tirk li gorî biryaran tevbigere divê Rêber Apo piştî 25 salan azad bibe.

Bi banga Rêber Apo ya Aştî û Civaka Demokratîk re ger “Mafê Hêviyê” were naskirin, dê ev bandorên mezin bike. Dê di haman demê de bibe bingeha naskirina mafên kurdan û wê li Tirkiye guhertinên cîdî pêk bên. Bêgûman wê ev ne tenê bandorê li Tirkiyeyê, dê li bakurê Kurdistanê û li çar aliyên Kurdistanê bike.

Di çarçoveya banga Aştî û Civaka Demokratîk de, îro em dibînin ku ne tenê kurd û aliyên azadîxwaz, ji derdorên cuda, xelatgirên Nobelê, sendîkavan, siyasetmedar, fîlozof û akademîsyen, banga azadiya Rêber Apo dikin.

Ev bang li ser bingeheke qanûnî û siyasî tên kirin. Her kesê/a ku mohra xwe datîne bin van bangan, di ferqa girîngiya doza zadiya Rêber Apo de ye û dizane ji bo çi divê ew azad bibe. Lê Dewleta Tirk ne tenê qanûn û hiqûqa xwe binpê dike, hewl dide bi nêpêkanîna “Mafê Hêviyê” qanûnên navneteweyî jî tune bihesibîne. Ev li gorî peymanên navneteweyî dikeva kategoriya sûc.

Di dawiyê de, mafê hêviyê ne tenê ji bo Rêber Apo, ji bo demokrasiya Tirkiyeyê û aştiya Rojhilata Navîn, pêdiviyeke girîng e. Ger ev maf were naskirin, wê li Tirkiyeyê jî hêviya azadiyê mezin bibe û modelek nû bi xwe re bide afirandin. Ji ber vê yekê çav li biryara civîna Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê ye. Bi taybetî gelê kurd, azadîxwaz û hêzên demokrasiyê, di vê serdemê de li benda biryarek erênî û bi hêz in. Ger di vê çarçoveyê de biryarek erênî derkev, wê ji bo çareseriya krîza li Rojhilata Navîn jî bibe bingehekê xurt.

Fariz Firaz

# Çareserî naskirina mafê hêviyê ye

Serokê MHPê Devlet Bahçelî di 22yê cotmeha 2024an de li Meclisa Mezin a Millî ya Tirkiyeyê li pêşberî hemû gelê Tirkiyeyê di civîna koma partiya xwe de bang kir. Bi hêrs diaxivî. Dîsa wekî her carê dikir qêrîn. Lê gotinê wî her kes şaşo maşo dikir. Ji her demê cudatir diaxivî. Di civîna koma xwe de bang li Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dikir. Di banga xwe de wiha digot: “Eger tecrîd rabe, bila bê li Meclisa Mezin a Tirkiyeyê di koma DEM Partiyê de biaxive. Bila bibêje ‘Teror bi temamî xelas bûye. Me rêxistin fesih kiriye. Eger vê biryarê û dîrayetê nîşan bide, dê ji bo sûd wergirtina ji “Mafê Hêviyê” zagon bên guhertin. Ji bo mafê hêviyê dê heta dawiyê derî û rê bêne vekirin. Ne Qendîl û ne jî Edîrne, bila navnîşana çareseriyê jî Îmraliyê heta DEM Partiyê dirêj bibe... Em ji vê yekê re amade ne.”

Di ser gotina Dewlet Bahçelî re 10 meh û 23 roj derbas bûn. Ji wê demê heta niha gelek tişt hatin guhertin. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi lez bersîv da banga Serokê MHPê Devlet Bahçelî. Di 28ê kanûna 2024an de ji bo çareseriyê nexşerêyeke ku ji 7 xalan pêk dihat aşkere kir. Berpirsiyarî da ser milê hemû sazî, partî û pêkhateyên li Tirkiyeyê. Di 27ê sibatê de Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan banga dîrokî kir. Bang li PKKê kir. Xwest kongreya xwe pêk bîne û xwe fesih bike û têkoşîna çekdarî bi dawî bike. Li ser vê bangê PKKê ewil di 1ê adarê de gavek avêt û agirbesta yek alî îlan kir. Di 5-7ê gulanê de kongreya xwe pêk anî. Di 12ê gulanê de biryarên dîrokî da. Xwefesih kir û biryar da ku çekan berde. Dîsa li ser banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, di 11ê tîrmehê de komek gerîlayên PKKê di pêşengiya hevseroka KCKê Besê Hozat de bi merasimeke dîrokî li pêş çavê cîhanê çekên xwe şewitandin. Peyama dîrokî da cîhanê. Gelê kurd, PKK û hemû sazî û dezgehên kurdan bi çalakiyan piştgirî dan banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û biryara PKKê. Vê çalakiya PKKê ya çek şewitandinê li hemû cîhanê deng veda û di hemû rojname û saziyên ragihandinê de wekî deqeya dawî û manşet hat dîtin. Gelek welatên cîhanê ev biryar pir erênî pêşwazî kirin û kêfxweşiya xwe anîn ziman. Destnîşan kirin ku ji bo aştî û demokrasiyê gaveke gelek erênî ye.

Di nava çend mehan de Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û PKKê gavên dîrokî û radîkal avêtin. Gavên ku PKK û Rêber Abdullah Ocalan avêt, gelek kes xistin nava şoqê. PKKê bi van gavên dîrokî hêza xwe ya li cîhanê bêtir mezin kir. Baweriya gelan a li hemberî xwe xurttir kir. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi vê bangê careke din nîşan da ku hemû gelê kurd û tevgera azadiyê li pişt wî ne. Careke din nîşan da ku her tim ji bo çareseriyê amade ye. Berê jî gotibû “Eger dewlet amade be, ez dikarin di nava hafteyekî de çareser bikim.” Di 23yê cotmeha 2024an de jî dema Omer Ocalan çûbû hevdîtinê gotibû “Eger şert û merc bên avakirin, hêza min a teorîk û pratîk heye ku ez ji zemîna şer derbasî zemîna siyasetê bikim.” Lê tevî ku dewletê gav neavêt û şertên zagonî amade nekir jî; dîsa Rêber Abdullah Ocalan gavên wêrek bi biryar û dîrokî avêt. Bi van gavên ku avêtin, nîşan da ku hêz û biryara wî ya çareseriyê heye.

Lê dema em li aliyê hikûmet, dewlet û meclisê dinerin, em dibînin ku ji xeynî avakirina komîsyonê tu gavên ku pirsgirêkê çareser bike nehatiye avêtin. Her çend Devlet Bahçelî got “Hodrî meydan” û pesnê xwe da jî, heta niha gavên çareseriyê nehatine avêtin. Her çend Devlet Bahçelî got ‘Em amade ne’ jî, xuya dike ku ji ber nakokiyên di nava hikûmetê de niyeta wan a gavan bavêje tune ye. Çima? Em çawa dizanin ku niyeta wan a çareseriyê tune ye? Ji ber ku heta niha ji bo “Mafê Hêviyê” tu gav nehatiye avêtin. Şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah ê tecrîd didome. Şande û nûnerên saziyan nikarin biçin Îmraliyê. Parêzer nikarin biçin Îmraliyê. Hîn girtiyên nexweş nehatine berdan. Hîn zext û tecrîda li ser şaredariyên kurdan berdewan dike. Hîn qeyûmê ku danîne ser şaredariyan paşve nekişandine. Hîn zimanê zikmakî li meclisê qedexe dikin. Hîn sansura ser çapemeniyê berdewam dike. Hîn operasyonên leşkerî berdewam dikin. Hîn balafirên şer ji Amedê radibin. Hîn destûr nadin ku malbat şîna zarokên xwe daynin. Hîn gundî nikarin vegerin gundên xwe. Hîn çalakiyên rewa û zagonî tên qedexekirin. Polîs bi fermana walî û qeymeqaman çalakiyên meş, daxuyanî ku mafê rewa û zagonî ye, dorpêç dikin û asteng dikin.

Ku rewş wisa be, dê gelê Kurd çawa baweriya xwe bi dewletê bîne. Ku rewş wisa be, dê çawa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan karibe fikr û nerînên xwe bi nûnerên saziyên civakî û partiyên siyasî re parve bike. Dê çawa karibe di şertên azad de bi hunermend, rojnameger, nivîskar, akademîsyen û nûnerên civakê re parve bike.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan piştî banga Aştî û Civaka Demokratîk, xwest komîsyon bê avakirin û komîsyon li Îmraliyê bi wî re hevdîtinê bike. Lê 40 roj borîn, hîna komîsyon neçûye Îmraliyê. Hîn şandeyên ku ji Ewropa û Tirkiyeyê ku dixwazin biçin Îmraliyê û bi Rêber Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikin nikarin biçin Îmraliyê. Hîn nikare ji “Mafê Hêviyê” sûdê bigere.

Di encamê de hîn tecrîd didome. Di ser biryara DMMEyê ya 2014an re 11 sal borîn. Di ser banga Devlet Bahçelî re nêzî salekê borî. Lê heta niha ji bo “Mafê Hêviyê” gavên çareseriyê nehatine avêtin. Gelo eger ji bo “Mafê Heviyê” gavên zagonî û hiqûqî nayên avêtin, dê gavên ji bo mafê parastina nasname û azadiya gelan çawa bê avêtin. Dê gavên ji bo Aştî û Civaka Demokratîk çawa bên avêtin. Eger dewlet û hikûmet di gavneavêtinê de israr bike, dê dawiya dawî pêvajo biteqe. Eger hîn qedexe, sansur, astengî bidomin, dê gel baweriya xwe bi dewletê neyne. Gel dawiya dawî dê wekî bendava ku biteqe, dê hemû zindiyan bide pêş xwe û kaosê derkeve. Tercîha vê yekê jî êdî di destê hikûmet û dewletê deye. Eger dewlet û hikûmet aştî, aramî û çareseriyê dixwaze, divê êdî zêde xwe giran neke. Divê êdî demê dirêj neke. Divê têkeve nava tegerê û bilez “Mafê Hêviyê” bide. Divê bi lez hemû girtiyên nexweş serbest berde. Divê ji bo mafê perwerdehiya zimanê zikmakî zagonên xwe rast bike. Astengiya li pêş perwerdehiya mafê zimanê kurdî rake. Divê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi awayekî fizîkî azad bibe. Ji bo vê yekê jî divê deriyê Îmraliyê bê vekirin. Çareserî azadiya fizîkî ya Rêber Abdullah Ocalan û naskirina hemû daxwazên gelê kurd e.



# Projeya Rêber Apo ji bo bextewariya civakan e

Kurd, bi mantika “oklîd gemotrî”, yanî li pêşberî aksiyonan, mantikî haraket dikin. Oklîd geometrî, teza matemtîkzanê Yewnanî Oklîd e. Tê wateya li pêşberî her aksiyonê, bi “mantiq”î tev digerin. Ev wekî geometriya jiyanê tê binavkirin



Medenî Ferho

Xwedayê kurd û dewşîrmeyên tirk, ne yek in. Mixabin dewşirmeyên tirk jî li ser navê gelê tirk hem serdest in, hem xwedî gotin in. Tirkên dewşîrme, xwedî giyanê Neron in û ji jargonên exlaqî însanî dûr in.

Di vê pêvejoyê de dema ku dewşîrmeyên tirk li ser pirsgirêka kurdan diaxivin, zimanê wan di aguşkên devê wan de hişk dibê. Dikin û nakin ji bilî gotina “biratî”yê gotineke din ji devê wan dernakeve. Vêca nayê zanîn ku biratiya ku tirk behsa wê dikin, gelo xwezayî ye, organîk e, civakî ye, siyasî ye, sosyolojîk e, felsefî ye, kîtabî ye, olî ye, kanunî ye, yan jî li derî van teva ye?

DEM Partî bi mehan e li welat û derveyî welat civînên gel çêdike. Dixwaze giyanê pêvejoyê bi gel bide fêhmkirin. Gel, hem banga Rêber Abdullah Ocalan û hem gavên ku PKKê avêtine fêhm dike. Daxuyanî û nirxandinên rayedarên KCKê û siyasetmedarên kurd jî ji nêz ve dişopîne bi wate dibîne. Mirovên li kolanan diaxivin jî, bi diyalektîka pêvejoyê diaxivin. Gel helwesteke kollektîf nîşan dide. Aştiyeke bi rûmet dixwazin. Ew rûmet jî rengê xwîna zarokên wan e.

Kurd, bi mantika “oklîd gemotrî”, yanî li pêşberî aksiyonan, mantikî haraket dikin. Oklîd geometrî, teza matemtîkzanê Yewnanî Oklîd e. Tê wateya ku amur-jargon (element) li pêşberî her aksiyonê, bi “mantiq”î haraket dikin. Ev tez, wekî geometriya jiyanê tê binavkirina. Kurt jî li gorî vê yekê tev digerin. Ji bo vê jî Kurd, di pêvejoya ku jiyana sed salên li pêşiya me eleqedar dike, weke “porter”ya siberojan dibînin. Di vê “potre”yê de têkçûn jî heye, serketin jî, lê eger têkçûn hebe para mezin wê bibe ya dewleta Enqereyê.

Ez bala xwe didimê akademîsyenên kurd, dema li ser pêvejoyê diaxivin, pîvanên Spînoza, yên matematîkî, yan jî pîvanên feylesofên sedsala navîn bikartînin; ji bûyerên dîrokî dest pê dikin û xwe digihînin jiyana rojane ya îro. Ev giring e û her bûyera ku li kolanan ji aliyê komên faşîst ve, li dijî kurdan têne pêkanîn jî, di çarçoveya “faşîzan” û xwedênenasiyê de binav dikin. Bêguman gotinên wan, ji sedî sed ne bi van gotinan e, lê di çarçoveya olî û felsefeya pençîkên ku di her firsetê de navê Xwedê û olê bikartînin de, şirk û kûfrê dikin û didine xuya kirin ola wan jî “maddî” ye.

Em dev ji gotina ku Xwedê dibêje; “Min her gel bi zimanekî cûda afirendiye” berdin û di çarçoveya sîstema îro ya “hîper kapîtalîst” de nêzîkî pêvejoyê bibin. Di honandina civakan de, di honandina organîk ya sêgoşe û çargoşeyî de ji helwesteke mîna pençîkan nin e. ji ber ku di her halî de, goşê wek hev in, ev jî bingeha hebûna xwezayî ye. Eger ev nebe, xweza jî, honandina gerstrêka cîhanê jî li ser piyan namîne.


Lê sîstema pençîk-dewşrime li derî van pîvanan e û mantiqê wan jî li derî bîrdoziya “oklîd geometrî”, li dijî hiş û ramanê filozofên sedsal navîn e.

Helwesta Numan Kurtulmuş jî ev e… Dema ku nehişt dayika kurd, li Komsiyonê bi zimanê dayikê biaxive, min li jiyana wî nihêrî û dît ku wî li dijî “Amentu Şerh”a Îslamê hereket kiriye. Kalikê Numan Kurtulmuş, mûxalifê “Amentû Şerh” e. Ji xwe Numan Kurtulmuş jî bi navê kalikê xwe hatiye binavkirin û kurê doktorekî ye. Doktor jî, bi sonda Hîpokrat dibin wijdanê civakan û însaniyetê. Nunam Kurtulmuş hem Îmam Xatîp ku nirxên ola îslamî pêşdixin xwendiye, hem di mijarên siyaset û bikaranîna çavkaniyên însanî de xwedî titra prof. tiyê ye. Mixabin!

“Amentu şerhi,” bingeha baweriya ola îslamê ye. Sahîh û sarîh e ku Numan Kurtulmuş li dijî bingeha baweriya ola îslamê hereket dike.

Xaleke din jî ew ku helwesta Numan Kurtulmuş, ya li dijî axaftina dayika kurd û bi zimanê dayikê, kortiya “atelyeya mêjî” ye. Kortiya “atelyeya mêjî” tenê di pençîkan de heye.

Eger di Komîsyona ku ji bo destnîşankirina nexşerêya aştî û civaka demokratîk de, axafina kurdî bê qedexekirin; ji bilî fêhmkirinê, divê mirov di çarçoveya giyanê şikestî û




çêkirî de, nêzîkî endamê komisyonê bibe. Lê xuya dike ku komisyon ne bi îradeya xwe, bi hestên fazîşan yên Turk-î Turan ku bingeha înkar û tunekirinê ye hereket dike.

Ji bo vê jî barê kurdan giran e. Pêvejoya ku bi inîsîyatîfa Rêber Apo dest pê kiriye, deriyê azadiyê, demokrasî, jiyana bi rûmet vekiriye. Lê armanca pençîk-dewşirmeyan nîn e ku vî derî re bikevin hundir û ji halet-î ruhiyeta bedena dirinde derkevin. Mêjiyê wan, hîna li gorî bedeneke çêkirî kar dike. Bedena çêkirî jî, di eyarê mirov de, “model”eke heydud e, bê îrade ye û li gorî fermana “ata”, “şef” û “reîs” haraket dike.

Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk, dewşîrme ji xew şiyar kirin, lê hîna şelîşî ne, şaş in, nizanin çi bikin. Ji ber ku ew yek rêyê nas dikin, ew jî înkar e û nêrîna bi berçavkên bergîlan e. Divê, berçavkên bergîlan ji ber çavên xwe rakin. Di her firsetê de, gotina “Tirkiyeyek bê teror” dubare dikin. Li hemberî ku feylesof, akameîsyen û zanistên cîhanê û hin ji yên Tirk jî, vekirî dibêjin, “terora heyî ya dewletê ye, aqilê xwe bidin serê xwe, pêvejoya aştiyê firseteke dîrokî ye…” Dîsa jî wek mirovê ku nû ji xew şiyar bibe û nizanibe ketiye çi xewnê û ji çi xewnê şiyar bûye, hereket dikin.

Dikin û nakin nikarin sîlsîleyeke maktîqî nîşan bidin.

Lê ew baş dizanin ku Abdullah Ocalan ev pêvejo, di çarçoveya sîlsîleyeke mantiqê de derxistiye pêş û daniya ber wan û pirr saxlem e. Lewma ditirsin û dev ji fikrê beriya sed û deh salan bernadin. Ew jî dîroka xwe baş diznain ku bi saya kurdan dewleta Enqereyê avakirin. Atayê wan Mustafa Kemal ev ratsî gelek caran aniye ziman û gelek dîrokzanên wan vê rartsiyê tînin ziman. Baş diznain ku himendî, hewngîrî bi zembîlan ji ezman nabarin û êdî ew nikarin gelê Kurd tune bikin. Rast e, gelên hatin qirekirin hîna di wê tirsê de û hesabê “nîn”in: lê gelê kurd, bi “kudret”ekî di rastiyê de ye, dîrok guhertiye. Fikrê Xwedê jî di rastiyê de daniye holê; mizgeftên ku weke konsolosxaneyên ereban, niha jî weke jeneretorên propagandaya Turk-î Turan kar dikin, bi rastiyê rû bi rû hiştine, mimberên wan mizgeftan li qibleya gelê kurd dinêrin.

Kurd êdî bi nefesa kurdî dijîn û kilîda serketina wan jî ew nefes e.

Binêrin, di vê pêvejoya Aştî û Civaka Demokratîk de, ew kesayeta ketî ya li dij nirxên însanî, li rojavayê Kurdistanê û li tevahiya Suriyeyê, bi “hasetî” nefret, kîn, fitne û teşqele hereket dikin. Jiyana pençîk-dewşîrmeyan û ya çeteyên paramîlter, weke DAIŞ û HTŞê yek in; nayê guhertin, weke sergerdeyên kolanan û çepelên derdora gundan hereket dikin. Hebûna xwe di aştî û demokrasiyê de nabînin. Ew dilgirtiyên zorê ne û divê zorê bibînin.

Ew civakeke heterojen in û nikarin di jiyaneke kozmopolît te û weke hev bijîn. Înkarkirina dîroka gelê kurd û gelê Anatolyayê ji vê ye. Li cem wan etîk û nirx, gotina “tirek”e, lê ew nizanin “tirk” çiye û kîye. Ev gotinek, biwejeke çêkirî ye û bi gotina Ezîz Nesin û bi gotina Feylesof Ulus Berker, ev ehmeqî û tîrantiya hestên şikestî ye. Di dîrokê de nehatiye dîtin, tu serdestan, tenê bi rêya zilmê, zext û zorê hebûna xwe nedomadiye. Kurdan weke ku Ereb dibêjin, ji pençîk û dewşîrmeyan gotina “etrak-i bî îdrak” bikarneanîne. Wek gel nêzîkî wan bûne. Li hemebrî ku sûcdar in, ew mehkumî ceza nekirin.

Lê ew û sîstema ku avakirin, gunehkariya Adem e. Ji bo ku gunehkariya xwe bidin windakirin, dirûşmeya “sêva sor- kizilelma” afirandine û gelên li derdora xwe û di nava xwe de tunekirin, bi rêya “tehcîr”ê, ji bihûştê derxistine. Ev helwesta wan li dijî hesabên geometrîk û metametîkî ye. Li cîhanê teva nifşekî din, çîneke din, civakek din nîn e ku bedena xwe di gunehkariya sêva Adem de, sor kiribe û gunehkarî weke jiyana esasî bijartibe. Ev stratejiyeke metirsiyê ye û di Komîsyona Meclîsa Enqereyê de jî ev helwest heye.

Kurd vê pirsê dikin: Gelo Komisyona Meclîsa Enqereyê, weke salên 1924an newî dadgeha Îstîklalê ye ku zimanê kurd, nasnameya kurdî, çanda kurdî di rengê “kaos”a nijada çêkirî ya Turk-î Turan da mehkûm bike? Bi gotina “divê rêveberên Tevgera Azadiya Kurdistanê biçin welatên wekî Skandinawya jî, dixwazin çarmixên li ser rêya Apîa avabikin?

Min ew weke Neron binavkirin. Neron nexweşekî giyanî û mêjî ye. Hem dayika xwe kuşt, hem Roma şewitan û bi amur ferîştehan “LÎR”ê melodî terwilandin. Dewleta Enqereyê jî, gelê kurd jî di serdemek nû de ne.

Dexalet û daxwaza çareseriyê ji rayedarên dewleta Enqereyê hat û Rêber Abdullah Ocalan jî berpirsiyarî girte ser milên xwe û pêvajoyeke dîrokî da dest pê kirin. Ev pêvajo ji bo gelên Tirkiyeyê û herêmê weke deriyê aştî û çareseriya hemû pirgirêkan tê dîtin. Despêka şoreşeke gelêrî ye û hîna em di destpêkê de ne. Projeya Birêz Abdullah Ocalan ya Aştî û Civaka Demokratîk, parvekirineke hevpar e, avakirineke bi tevna nû ya civakan e û guhertina di hişmendî û hewngiriya mirov û hemû amurên civakî de ye. Ev proje, eger biserbikeve, wê bibe bingeha bextewariya her kesî.

# Dewleta tampon wekî amûrek hegemonyaya DYA



Kurdistan Lezgiyeva

Zanyarê siyasî yê Amerîkî John Mearsheimer di pirtûka xwe ya sala 2001an de a bi sernavê The Tragedy of Great Power Politics nivîsandiye: “Sîstemên pirqutbî”, ku ji hêla gelek aktorên bihêz ve têne xuyakirin, bi xwezayî ji sîstemên du qutbî bêtir meyldarê pevçûnê ne. Ev ji ber ku hejmareke mezintir ji aktorên bi berjewendiyên reqabetê, ji bo avakirina hevpeymanî û reqabetê diafirîne, ku dibe sedema bêîstîqrarî û zêdebûna pevçûnan.”

Girîng e ku mirov fêm bike ka rêzîknameya nû ya cîhanê çawa tê birêvebirin. Yek ji însîyatîfên herî girîng hewldana Dewletên Yekbûyî (DY) ye ku hegemonyaya cîhanî bi afirandina dewletek tampon li herêma Asya-Pasîfîk, bi taybetî bi dayîna vê rolê ji Hindistanê re biparêze. Dewletên Yekbûyî neçar e ku ji ber gelek sedeman, di nav de cihê wê yê erdnîgarî yê stratejîk li Okyanûsa Hindî û hêza wê ya girîng a aborî û leşkerî, xwe bispêre Hindistanê. Bi vî rengî, Hindistan dikare bibe lîstikvanek sereke di parastina aramîya herêmî de, bi hevkarîya DYA ji bo çareserkirina pirsgirêkên ewlehîya herêmî. Di encamê de, lîstika sereke li herêmê di navbera Çîn, Hindistan, Pakistan û DYyê de ye.

Tevî dijwarîyan, DYAyê hewl dide serdestîya xwe biparêze. Fikarên li ser derketina hêzên nû, bi taybetî Çînê, bûne sedem ku DYAyê hewl bide hêza xwe ya aborî û leşkerî biparêze, têkilî û hevpeymanên dîplomatîk xurt bike û îdeolojiyên ku piştgiriyê didin serokatiya wê biafirîne. Lê, Washington êdî di navenda pergala cîhanî ya heyî de nîne. Hegemonyaya wê ji hêla welatên din ve hatiye şikandin û pergala cîhanî piralîtir bûye. DYA divê niha xwe li gorî şert û mercên heyî xwe biguncîne. Armanca sereke ya DYAyê di cîhaneke pirqûtbî de ew e ku bandor û berjewendiyên Washingtonê serdest bimînin. Ev tê wateya parastina serdestiya Amerîkayê, garantîkirina aramiyê li deverên sereke û pêşîgirtina li derketina holê ya hêzên nû yên super.

DYA niha hewl dide ku “Amerîkayê Dîsa Mezin Bike” ne tenê ji bo ku bijî, lê di heman demê de serdestiya xwe jî biparêze. Ew hewl dide ku bi rêbazên tarî kontrola pergala cîhanê ya heyî ji nû ve bi dest bixe û hegemonyaya xwe li herêma Asya-Pasîfîkê bi baregeha Hindistanê biparêze. Armanca wê ew e ku rê li ber bilindbûna Çînê wekî hêzek derketî bigire. Hindistan tevlî hevpeymaniya Çaralî ya Avusturalya, Hindistan, Japonya û DYyê bûye da ku herêmek Hind-Pasîfîk a vekirî, aram û geş pêş bixe. Ev hevpeymanî DY û Hindistanê di warê bazirganî û têkiliyên leşkerî de nêzîkî hev dike.

DYA bawer dike ku Hindistan dikare wekî astengiyek li hember berfirehbûna Çînê li herêmê, bi taybetî li Deryaya Başûrê Çînê û Deryaya Java, tevbigere. Wekî hevkarê stratejîk ê DYA, Hindistan beşdarî kontrolkirina berfirehbûna Çînê û misogerkirina parastina berjewendiyên herêmî yên DYAyê dibe. Wekî din, Hindistan piştgirî dide polîtîkayên herêmî yên DYAyê, bi taybetî yên ku azadiya seyrûseferê li Deryaya Başûrê Çînê û dadperwerîyê di pergala aborî ya navneteweyî de pêş dixin. Bi alîkariya Hindistanê, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dikarin bi bandortir li dijî serdestiya Çînê rawestin. Hindistan di heman demê de hevalbendê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ye di misogerkirina aramiya cîhanî de ye. Hevkariya DYA-Hindistanê dibe alîkar ku li dijî pirsgirêkên cîhanî, di nav de terorîzm, guherîna avhewayê û nexweşiyên kujer şer bike. Bi vê yekê, ew potansiyela hevalbendiyek nêzîktir di navbera her du welatan de li ser navê berjewendiyên neteweyî zêde dike.

Ji ber wê ne ecêb e ku DYA hewl dide şerekî wekaletî di navbera Çîn û Hindistanê û di navbera Hindistan û Pakistanê de bide destpêkirin da ku li dijî hegemonyaya Çînê di rêveberiya cîhanî de derkeve. Her welatek di pergala pirqatî ya îroyîn de, ku ne li ser yek eksena navendî ye, armanca xwe heye. Çîn di hewldanên xwe yên ji bo dijberiya Hindistanê wekî hevalbendek DY de piştgiriya Pakistanê dike. Ji aliyê xwe ve, DYA Hindistanê wekî baregehek bikar tîne da ku serdestiya Çînê li Asyayê sînordar bike. Di heman demê de, Hindistan û Pakistan di hilbijartina tevgerên xwe yên navneteweyî û rêya siyaseta derve de bi giranî ji hêla berjewendiyên xwe ve têne rêve kirin. Ne tesaduf e ku Hindistan jî teknolojiya Rûsyayê bikar tîne. Her weha di vê navberê de, Pakistan hêjî berdewam dike ku xwe bispêre teknolojiya Amerîkî û Tirkiyê.





Rohat Bulut

# Rastiya qirkirin û talanê



Rojnameger Nedîm Orûç li ser talan û qirkirina xwezayê her wiha birîna daristanan heta niha tiştê ku parve nekiriye aşera kir. Orûç, destnîşan dike ku ligel polîtîkaya dewletê û birîna daristanan a bi destê cerdevanan, gundî jî ji bo pereyan dixwazin daristan bên birîn. Orûç da zanîn ku navê gelek kesên dibin şirîkê vî sûcî ji aliyê saziyan ve tên parastin û mijara sereke ya sazî û partiyên siyasî jî ne pêşî lêgirtina qirkirin û talanê ye

Bi salan e xwezaya Kurdistanê ya ser erd û bin erd bi destê dewletê tê talankirin, bi taybetî jî daristan, berê dişewitandin niha jî dibirin. Dewlet daristanên li Kurdistanê bi destê cerdevanan dide birin û di gelek kes di nava vê tora qirkirinê de cih digire. Wekî çapemenî em jî armanc dikin ku vê talan û qirkirina li ser erdnîgariya xwe bi raya giştî re parve bikin ku pêşî lê bê girtin. Wekî çapemenî me her tim ev kiryarana teşîr kiriye û em ê teşîr bikin. Ji bo hestiyariyek di nav civakê de ava bibe û li pêşiya vê qirkirinê bê girtin, em ê bi her rê û rêbazî vê qirkirina xwezayê vebêjin. Hevalê me rojnameger Nedîm Orûç ku ji herêmê ye, li ser vê talan û qirkirinê nerîn û çavdêriyên xwe bi me re parve kir.

**Dijminên xwezayê**

Li gorî rojnameger Nedîm Orûç destnîşan dike ev tora qirkirê berfireh e û serê şivê heta ku digihêje gundiyan bi xwe. Orûç li ser mijarê wiha dibêje: "Helbet bi dehan salan e, erdnîgariya Kurdistanê ji her alî ve, an bi destê dewletê, an jî bi destê kes û derdorên nêzî dewletê tê talankirin. Bi taybetî di 10 salên dawî de ev talana li ser xwezaya Kurdistanê di asta herî jor de berdewam dike. Li Botanê ji sala 2018an pêde ji bilî vekirina kanên komirê, çêkirina "Bendavên Ewlehiyê", derxistina petrolê, daristan tên birîn. Destpêka birîna daristanan ji derdora qeleqolên li ser çiyayên Cûdî, Gabar, Heftenîn, Herekol, Komate, dest pê kir. Hêzên artêşa tirk ji bo ewlehiya xwe bistînin, xwest derdora van qeleqolan bi qasî 200-300 mîtro daristan werin birîn. Ev talan jî bi destûra artêşa tirk bi destê cerdevanên bajaroka Sêgirgê ya navçeya Qilebana Şirnex û cerdevanên gundê Hosyan ya navçeya Berwariya Sêrtê, her wiha hin cerdevanên navçeya Basa ya Şirnex hat kirin. Piştî cerdevanan dît ku pereyek baş di bazirganiya êzingan de heye, serî li rêbazên cuda dan û qaşo ji ber ewlehiyê destûr ji Gerînendeyên Daristan û Çandiniyê yên Şirnex û Sêrtê xwestin. Piştî destûrê ji gundiyan re gotin 'dewletê gotiye daristanan bibirin' û ji birîna daristanan hin pere jî teklîfî gundiyan kirin. Gundiyên ku qebûl nekirin daristanên wan bên birin jî hene, lê piraniya gundiyan ev yek qebûl kir û talana daristanan berdewam kir. Dema gundên derdorê bihîstin daristan tên birîn û pere didin gundiyan jî gelek keyayên gundan xwe gihand van cerdevanan ku werin daristanên gundên wan jî bibirin."

***Piraniya gundiyan pereyekî baş digirin***

Bi domdarî li ser pirsa; Li Kurdistanê cihekî bê xwdî tune ye. Ew daristan bi xwe jî welatî li hev parve dikin û dihebînin. Pêdiviyên xwe yên şewatê ji daristanên ku dihebînin bi cih tînin. Gelo ev rewş ji bo herêma Botanê ne derbasdar e? Heke ev daristan ên welatiyan be, çavkaniya wan a jiyan û debarê be, gelo çima helwestek tund nîşan nadin? Nedîm Orûç, van tiştan tîne ziman: "Rast e li Kurdistanê deverek bê xwedî tuneye. Ji deştan heya çiya her dever yên hin kesa ne. Hin dever jî çiqas weke malê xezîneyê xuya bike jî hatiye parvekirin. Ev deverên ku daristan lê tên birîn ji bo çûyîna şêniyên gund heta niha jî qedexe ye. Piştî pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bi destûrê hin şênî diçin gundên xwe yên salên 90î hatine valakirin. Lê dewlet destûrê nade ku bi şev li gundên xwe bimînin. Her wiha her dem jî destûr nayê dayîn. Piraniya deverên daristan lê tên birîn bi destê cerdevanan û pêşkêşiya kesên nêzî dewletê yên ji wan gundan pêk tê. Gundiyên xizan û welatparêz nikarin li hember vê zordariya cerdevan û kesên nêzî dewletê rawestin. Lê piraniya gundiyan ji ber ku pereyek baş digihêje wan deng dernaxin."

**Gundî bi pereyan bêdeng dimînin**

Em dibihîzin ku di nav civakê de carnan ji bo qevdek giya, yan mirîşkekê yan jî ji bo tiştekî nehêja hevdu dikujin. Lê bele axa wan tê dagirkirin, talankirin, qirkirin û mêtingeriyek kûr tê meşandin lê bêdeng e, yan jî ew nerazîbûn têrê nake.


Li ser vê nakokiyê jî Nedîm wiha got: "Li Botanê jî gelek caran ji ber sedemên piçûk şerên bi mirinan encam bûne derketine. Şêniyên gundan ên ku dibin şirîkê cerdevanan bi awayek veşartî vê yekê dikin. Dema aşkera dibe an jî îdea derdikevin vê yekê înkar dikin. Weke mînak niha şêniyên Gundikê Remo yê di nava Çiyayê Cûdî de hin bûne şirîkê Suleyman Bolunmez ê AKPî û xwediyê qanên komirê, hin şênî jî doz vekirine. Lê yên doz vekirine jî ji ber ku ew û Bolunmez li hev nehatine doz vekirine. Wekî din li aliyê navçeya Elkê ya Herêma Bêtkar heta daristanên wir jî hin cerdevanên Sêgirgê birîne û ji ber dabeşerkirina pereyan şêniyên gundên derdorê li hev ketine û niha gelek şêniyên di heman gundan de ji hev xeyîdîne. Weke çavdêriyekî dikarim bibêjim ku her dara tê birînê an jî her komira tê derxistin ji ber ku şêniyên gund pereyê xwe distînin bê deng dimînin."

***Mijara sereke ya partî û saziyan ne talan e!***

Di rewşeke wiha de bêdengiya li dijî van polîtîkayên talan û qirikirinê, bêdengiya civak û saziyên sivîl ên civakî mirov dixe nav fikaran. Nedîm Orûç, bi dîtin û tespîtên xwe vê fikara me jî zelal dike û van tiştan tîne ziman: "Li herêmê hişmendiya parastina xwezayê kêm e. Navçeyên weke Cizîr û Silopya debara xwe ji bazirganiya Deriyê Sînor ê Xabûr pêk tînin. Ji ber ku debara wan ne ji axê ye, hişmendiya talana xwezayê jî qesl e. Her wiha navenda Şirnexê jî debara xwe piranî jî bi kanên komirê dertêxe û hişmedî dîsa qesl e. Saziyên ekolojiyê yên heyî jî ji ber vê yekê kêm dimînin. Hêz heye ku têrê bike lê ev hêz bê hewldan e, ji ber vê yekê têrê nake. Her wiha saziyên din jî piranî ji bo bertekê li benda navendên xwe dimînin. Mijara navendan a sereke jî ne talan e, ji ber vê yekê qelsî heye. Mînak ev 7 sal in daristan tên birin, ji bilî hin pirsnameyên parlementerên herêmê tu bertek nehatine dayîn."

***Talanker ji aliyê saziyan ve tên parastin***

Li dijî vê talanê meş pêk hat, daxuyanî hat dayîn û du rojan li Bestayê nobet hat girtin. Bê guman ev bi nirx e, lê em dizaninku ji bo sekinandinê têrê nake. Ji bo sekinandina vê qirkirin û talana xwezayê pêwistî bi teşîrek berfireh heye. Di vê derbarê de jî Nedîm van tiştan tîne ziman: "Bi giştî kesên tiliya wan di talana xwezaya Botanê de hene, xwe aşkere nakin. Ji ber ku xofa Tevgera Azadiyê li ser wan heye ev kes naxwazin navên wan werin aşkerekirin. Hin kesên di saziyên sivîl de cih digirin van kesan baş nas dikin û dema xwestek hebe ev kesên talanker werin aşkere kirin jî, kesên di saziyan de ji bo vê yekê dibin asteng. Bi tevahî pêk neyê jî ji bo talan hinekî bişkê divê ev kesan werin aşkerekirin û her kes bizane ku kî vê talanê dike. Li gundan kî bûye şirîkê dewlet û cerdevanan ku daristan tên birîn. Kesên cerdevan û AKPî ji xwe navên wan her kes dizane, lê kesên ji wan re pêşkêşiyê dikin nayên zanîn û ev bi sedan kes in."



Ahmet Aktaş

# Bêhna lîstokan tê!

Pêvajoya çareseriyê bi germî despê kiribû, lê di van her du mehên dawî de hinek sistayî û xemsarî tê xuya kirin ji aliyê dewletê ve.

Bi avakirina Komisyona Meclisê re, hêviya pêşveketina pêvajoyê zêdetir bû, hinek gavên pozitîf-kêrhatî jî hat avêtin, lê weke ku "eqlê jor" ji Nûman Kûrtûlmûş re got, "gavên xwe sist bike"!

Yek ji nîşana wî ya negatîf a nerînî, helwesta wî ya li dijî dayika ku bi zimanê kurdî axivî bû.

Her wiha gotina "Tirkiyeya bê teror" jî li ser zimanê xwe navêje, li serê gotin û binê gotinên xwe, vêya weke benîşt bicû vedibêje.

Li pey wî Receb Erdogan jî, dîsa dest bi qebedayitiyê kir û gotinên tal û tûj rêz kir; nizanim "heke şûr ji kalanê-qalikê xwe derkeve, carek din venagere kalanê xwe û êdî xêr, di qelem û kelamê de namîne" û hwd!

Devlet Bahçelî jî dibêjê, "bila Abdullah Ocalan carek din bang li YPGê bike ji bo ku çekên xwe deyne" û hwd!

Weke ku ji beşdarbûna CHPê ya komîsyonê jî ne razî bin, lewma êrîş û gefên ser vê partiyê dijwartir û xetertir dikin.

Bendewarî heye ku piştî êrîşa ser navenda Stenbolê, êrîşî ser navenda giştî ya CHPê jî bikin û bi tevayî qeyûmê bavêjin ser serok û teva rêveberan.

Ev jî nîşaneyek e ji bo ku xebata komisyonê were lawazkirin û ev tê wateya ku di encamê de pêvajoyê bidin rawestandin, mîna pêvajoya berê.

Çûn û hatina Îmraliyê, heyvekê dan rawestandin, li goreyî gotinên despêkê, wê rêya Îmralî bi tevahî bihata azadkirin, helbet tedbîrên ewlekariyê wê werin stendin, lê belê wê astengiyên li ber hevdîtinên bi Rêber Apo re, bi tevayî bihata rakirin û êdî wê kariba azad dansûtandin pêk anîba.

Li Bakur, Başûr û Rojava, bi tevayî diviya bû, di çarçova cewherê pêvajoyê de hewldanên kêrhatî û pozîtîf, bi hêsanî pêk hatibana.

Lê mixabin, her çend di despêkê de hinek gavên erênî hatibin avêtin jî, di vê dema dawî de hema hema ev jî hatin rawestandin, berevajî, li pir cih û herêman hewldanên xerabkar pêk hatin.

Weke mînak li dijî niştecihên Şengalê, Mexmûrê, Eşrefiyê, Şexmexsûd û hwd. helwestên xerab pêk hatin.

DYA, hem dibêje "em ê hejmara neferên xwê yên leşkerî li Rojava kêm bikin" hem jî Konsolosa wan a Hewlêrê Green dibêje "em ê li Herêma Kurdistanê karê xwe yê bazirganî xurtir bikin"! Herkes zane ku parastina vî karî, hewcedarî bi hêza çekdarî ya xurt heye!

Li aliyê din jî dibêjin, "heke li vira amadekariyên leşkerî nebin (bi taybetî li ser hevkarî û têkiliyên xwe yên bi HSDê re vê gotinê bi kartînin), wê DAIŞ dîsa bi hêz bibe!

Colanî, neçû Parîsê û li wira beşdarî hevdîtinên li gel Mazlûm Ebdî nebû. Tê gotin ku dijberî vêya, hewldan heye ji bo ENKSê bikişîne Şamê û li gel wan rûnê. Ev jî tê wateya şantajekê ya li dijî HSDê û Rêveberiya Xweser.

Her wiha, piştî gerandina wî ya li hinek dewletên navdar ên Ereban mîna Siûdiyê, îca nuha wî dikişînin Washingtonê jî.

Macron, li pey vê bûyerê, Mesûd Berzanî vexwend Parîsê û Mesûd li vira hinek gotinên balkêş kir, got "heke êrîş were ser Rojava, ji bo biçin hewara wan, ez ê fermanê bidim peşmergeyan û berê wan bidim Qamişloyê"!

Li vira, divê nakokiyên navbera siyaseta Fransa û hinek dewletên Ewropayê din a li gel siyaseta DYAyê jî neyê jibîrkirin.

Ji van mijarên balkêş, bêhna siyasetek genî û kirêt jê tê.

Ma gelo nabe, ew "eqlê jor" bixwaze li van dewletên mîna Iraq, Sûriyeyê û hwd, rejîmên wan jî, mîna Efxanistanê radestî cîhadîstan bike.

Heta li Tirkiyeyê jî, bi destê AKPê heman sîstema cîhadîst a fermî saz bikin, ku jixwe rejima heyî bi heman zihniyetê ev 22 sal in Tirkiyeyê bi rêve dibe.

Gûman heye ku lewma destên xwe ji desthilatiya Receb Erdogan nakişînin û dibe ku temenê rejima wî dirêj bikin û van rejîmên cîhadist hemûyan bi hev ve girêdin û Receb Erdogan jî bike koordinatorê wan!

Wisa diyar e DYAyê û hevalbendên xwe, bi karanîna van şêwazan û hinek şêwazên din ên cuda cuda; bi hevpeymanên Brahîmî, Israilê û dewletên Ereban weke eniyekê li hev kom bike, li aliyê din bi zihniyeta cîhadîstan Tirkiye, Iraq û Sûriyeyê jî bikişîne rex vê eniyê, li pey wê jî heke karibe hêza kurdan jî bikişe ba xwe, êdî wê bi hêsanî karibe êrîşî Îranê bike û hilweşîne rejîma îmamên şîayê îdamîstên Îranê.

Belê wisa diyar e jî bo Tevgêra Azadiya Kurdistanê bikişîne xizmeta siyaseta xwe, gelek zahmetiyan dikişînin.

Sedemên sistkirina pêvajoyê jî, tehdîdên Receb Erdogan û nerawestina êrîşên ser gelê Kurdistanê û li ser her sê parçeyên Kurdistanê jî ev e! Da ku li hember Rêber Apo, destên xwe yê bazara siyasî xurtir bikin. Helbet gûmana serketina wan xeyal e!

Bila ev şîrove, weke dîtinek reşbînî neyê dîtin, belê ji bo amadekariyên xurtir, hewcedarî bi hişyariyan jî heye.

Bêgûman navenda bazara siyasî û pêşengê pêvajoyê Rêber Apo ye.

Lewma, ji bo xurtkirina destê Rêber Apo di bazara politîk de, divê him tevger û him bi giştî gelê welatparêzê Kurdistanê, hîn xurtir, hîn pir şêwaz û hîn pir reng bixebite!

# Vîrameyîşê Jîna Amînî

## Têkoşînê azadî yê cinîyanê kurdan her ke şino pîlêr beno û pergalê cinsîyetperestî tersneno. Emser zî cinîyê kurdî verê vîrameyîşê Jîna Amînî de çewt benê û wayîrê xoverdayîşê aye vejînê

Merkezê Xeberan




Naye ra 3 serran verî Mahsa Jîna Amînî ya 22 serre Îran de bi destê polîsê exlaqî yo ke kontrolê çitike keno, ameye destbendkerdene. 3 rojan ra dima Amînî ameye qetilkerdene.

Polîsê Îranî vat ke Amînî binê destbendkerdişî de krîzê qelbî ravîyarna, şîye nêweşxane û uca de dinyaya xo bedilnaye. Bêguman no vatişê polîsî duştê raştîye bî. Çike polîsî a destbend kerde, kute û wina qetil kerde. Yanî Dewleta Îranî yew cinîye seba ke çitike nêeşte serê xo qetil kerde. Rejîmo kanperest, cinsîyetperest, qirker, nîjadperest û hêrişkar wina yo. Yew cinîye nê rejîmê qilêrinî de nêameye pawitene. Camêrdan mîyanê xo de kiştiş serûber kerd.

**Rîpêşê rejîmî**

Qetilkerdişê Jîna Amînî bêşik heme Îran de vengêko pîl vet. Hema hema 80 şaristan û bajarekan de çalakîyî virazîyayî. Nê çalakîyan de zî 17 merdimî kişîyayî. Serêbûtê Amînî ra dima Îran de her çî bedilîya.

Êdî "rîpêşê" rejîmê mollayan kewt. Êdî heme şaranê Îranî dî ke nê rejîmê kanperest û xeripîyayî de aramîye û zerreweşîye çin a. Êdî her merdimî çax kerd ke no rejîm heqanê merdiman nêpaweno. Êdî eşkera bî ke nê rejîmê nîjadperestî de de "decadence" est o. Sey çopgehî boya giran a xirabe dano. Ne seba şaran ne seba bawerîyan ne zî seba nasnameyanê Îranî no rejîm êdî çareser nêbeno. No rejîm raverşîyayîş, demokrasî, edalet û azadîye nê, dişmenîye, kanperestîye, yewperestîye û serdestîye armanc keno. No rejîm merdimî rê zîndanan dîyarîye keno.

**Dara okaluptusî**

Ewro têgêrayîşê azadî yê cinîyan wayîrê têkoşînê Mahsa Jîna Amînî vejîno û xoverdayîşê aye raver beno. Têgêrayîşê azadîye maneno "dara okaluptusî". Seke zanîyeno na dare vera her demserre deyax kena. Zimistan bibo, vewre bibo, şilîye bivaro, pûkeleke bêro, germo giran bo, se beno wa bibo têgêrayîşê cinîyan asteng nêkeno. Na seserre wina aseno ke do seserra şorişê cinîyan bibo. Pergalo pederşahî qerqele de yo û o do netîceya xoverdayîşê cinîyan de birijîyo. Xora seba demokrasîyê rastikênî ganî cinîyî azad bibê. Bê azadîya cinîyan ne demokrasî beno ne zî hemwelatîya têduşte bena. Na çarçewa de Şorişê Rojawanî zaf girîng o. Çike no şoriş eslê xo de şorişê cinîyan o. Ruhê Jîna Amînî mîyanê nê şorişî de ciwîyeno. Şorişê Rojawanî têna seba herêma Rojawanî nê, heme Rojhelatê Mîyanênî rê rayîrê azadîye akeno û pêro şaran rê îlham dano.

# Ziwanê ma rê statu şarê ma rê azadî



Cemîle Turhalli

No hewte serra 2025-2026î ya akademîke dest pêkerd. Nê abîyayîşî dewamkerdişê bêdaletîye reyna ard verê çimanê ma. Bi mîlyonan gedeyanê kurdan rê no abîyayîş xeyrên nêbi. Xeyrên nêbi çunke gedeyanê kurdan nê mekteban de bi ziwanê xo ney, bi ziwanê xerîbî dest pêkerd.

Wexto ke mi zî dest pê mektebî kerd, mi tirkî nêzanayêne. Yeno vîrê mi her kesî hewşê wendegehî de bi nîzamî rêze girewtbî, mi zî bi formaya xo ya sîyaye xo amade kerdbî û kîştêk ra aleqnayîşê beyraqe kîştêk ra zî gedeyî temaşe kerdêne. Heme gedeyî sey leyîranê mîlçikan asayêne. Cayêk ra vengêkê berzî reyde sondê tirkan wendêne, cayêk ra zî cinîqîyayêne. Ez ewil nêeşkayêne sond biwana, çunke mi tirkî nêzanayêne. Badê cû mi senî ezber kerd o çax mi rehet wend. Labelê mi nêzanayêne manaya ey çi yo? Çend aşman ra dima ez hêdî-hêdî tirkî musaya, mi manaya sondî fehm kerde û uca ra pey mi zî êdî wendişê sondî ra fek verada. Na estaneke 20-30 serran verê cû bi şeklêko nêzdî sereyê heme kurdan ra vîyarta. Zafê gedeyanê kurdan destpêkê mektebî de yan qet tirkî nêzanayêne yan zî zanêne ke no sond semedê înan çîyêko baş nîyo. Semedê xo heqeret vînayêne. Şima zanê şima tirk nîyî, şima zanê pîlê şima Atatirk nîyo, şima semedê çi xo feda bikerî. No wendiş zerrî ra nêbi. La çi heyf ke nameyê ci sond bi.

No mesele semedê gedeyanê kurdan hem trajîk hem zî travmatîk o. Heta psîkolojîyê înan de no travma serkewtîşê perwerdeyî û têkilîya embazîye rê tesîrêkê negatîfî virazeno. Merdim vano ke semedê çi ez nê halî de ya. Vera-vera vîneno ke hîsê heme gedeyan seyyewbînan o, labelê nêeşkenî yewbînan rê îtîraf bikerî.

Helbet bingeyê nê meseleyî de zanayîş û nêzanayîş ferq nêkeno. Her gedeyo kurd zano ke pê wendişê sondî merdim tirk nêbeno. No ziwan ziwanê to nîyo, çunke nê ziwanî reyde ti rehet nêeşkenî xo îfade bikerî. To nê ziwanî reyde hes nêkerdo, kay nêkerdo, nêqîrayî/ya, nêbermayî/ya, nêhuyayî/ya, pêro nêdayo, nengî nêçînayî/ya. Herçiqas ti bi fek biwazî bibî tirk, labelê ti raştî de qetî endamê nê mîletê tirk nêbenî. Seba ke cematê to xo ra nêvano ma tirk î, vano ma kurd î û cemato tirk zî to tirk nêvîneno. To rê vanî yan şakî yan zî rojhelatî.

Bingeyê nê meseleyî de helbet bindestîya kurdan û kolonyalîzm est o. Her kes zano ke erdê kurdan de kurdî xo bi xo, xo îdare nêkenî. Ne wayîrê erdê xo yê, ne zî mêman yenî qebulkerdene. Ti wayîr nîyî, çunke ti nêeşkenî teseruf bikerî, ti mêman zî nîyî, kesêk qîymet nêdano to. Vêşanîya to zî, têşanîya to zî xemê înan de nîyî. Keyeyê to de sey dizdî, sey sucdarî ewnîyenî to ra.

Wexto ke merdim yeno sûke no vînayîş hîna zelal beno. Resmê her cadeyî resmê bi şeklêko îşxal xo nawneno. Erebeyê toma û panzeran ra bigîrî heta kontrolê asayîşî û qerekolan reyde xo weş nîşan dano. Her goşe de zî alaya dewlete est a. No îşxal tewr zaf têkilîya şar û esker, polîsan de xo mojneno. Endamê edlî, sey esker û polîs heme burokrasîyê dewlete, nê erdî ra nîyî teberî ra ameyî. Ziwanê kurdan zî nêzanî. Şarê tîya xo ra nêvînenî û înan sey çimê dişmenî vînenî û qet têkilî bi qestî înan de zî nêvirazenî. Ne şinî tazîyeyê înan ne zî şinî nêweşîya înan. Ne embazîye kenî ne zî cîranîye. Seba aye kurdan hemwelatîyê na dewlete zî nêvînenî, neheqîyekerdiş xo de heq vînenî. Goreyê înan kurdî sadiqê na dewlete nîyî, înan îsyan kerdo seba ke vato ma tirk nîyî. Gedeyanê înan zî sey terorîstê ameyoxî vînenî. Sucê dewlete zî sey suc nêvînenî. Wexto ke hemverê esker û polîsan de mexdur kurd bi, o çax faîlan rê bêcezayîye heq vînenî. Helbet nê heme polîtîkayê cîyakerîye û goreyê çimê înan de huqûqê dişmenîye nîşan dano û nêzdîbîyayîşê înan eşkera keno.

Ma hemîne zanê ke awanbîyayîşê dewleta tirke tena xo etnîsîteyêkî ser o netewe qebul kerd û etnîsîteyê bînî zî înkar kerdî. Ziwanê înan zî ziwan qebul nêkerd. Dewleta tirke awanbîyayîşê xo ra heta nika waşt ke heme şaran bikera bindesto etnîkî. Heme şaran binê şarêkî de bihelno, înan vîndî bikero. Polîtîkaya qirkerdişî ra bigîrî heta koçkerdişê bizorî, tewqîfkerdiş û asîmîlasyonî ra heta înkarkerdiş nika zî fek veranêdayo. Verê cû kurdî qet çinî bî, labelê nika est î, o zî bi şeklêko goreyê ey est î. O zî "kurdêko meqbul" o. Meqbul kurd çi yo? Semedê xo çi wazeno wa biwazo, labelê ganî qetî semedê şarê xo çîyêk nêwazo. Pîzeyê xo wa mird bikero, labelê ganî vêşanîy û têşanîya şarê xo rê wa çimanê xo biqefilno. Îmtîyazê na dewlete ra wa sual nêkero wa xo rê şikir bikero. Hende ziwanê xora wa bişermo ke wa lez ziwanê xo ra fek verabido. Fikrê xo zî hîsê xo zî erdê xo zî teslîmê desthilatdaran bikero û wa destê xo înan ra hertim akero. Ma eşkenî vajî ke wazenî kurd her çi beno wa bibo, labelê kurd wa sey kurd nêbo. Nê heme îhtîmalî wezîrê edaletî yê verênî Mahmud Esad Bozkurtî bi fekê xo îtîraf kerdê û vato "Goreyê fikrê mi, qenaatê mi no yo ke, no welat bi xo tirk o. Ê ke xo tirk nêvînenî, heqêkê înan est o, o zî xizmetkarîy û koleyî ya''. (Nutkê Odemîşî- 19ê êlule 1930)




Kurdan ne koleyîye ne zî xizmetkarîye qebul kerde. Şerefê xo serê her çîyî de vîna. Ganê xo ra fek verada la şerefê xo ra fek veranêda. Milkê xo ra fek verada ziwanê xo, kulturê xo û kokê xo ra fek veranêda. Semedê ey ziwan estbîyayîşê ey bi.

Nika her het ra kurdî waran de vengê xo berz kenî, semedê ziwanê xo statuyê huqûqî wazenî. Seba ke zanî statuyê ziwanê înan çin o, nameyê ziwanê înan goreba dewlete ''ziwanêko nêyeno zanayene'' yeno qebulkerdene. No pênaskerdiş bingeyê desthilatdaran helbet eşkera keno.

Kurdî wazenî ke ziwanê înan bibo ziwanê perwerdeyî û bibo ziwanê resmî. Eke ziwan warê pêroyî de nêro qebulkerdene, statuyê înan zî, o zî vîndî beno. Semedê aye warê pêroyî de hezaran cinî, dayîke, xort, kal û pîrî sey gilê dare xo resnenî her ca, dest danî yewbînan û semedê statuyê ziwanê xo têkoşînêkê pîlî danî. O çax ma zî vajê ke "semedê ziwanê kurdkî statu, semedê şarê ma azadî".



Suzan Vejan Tatli

# Veng

Hetêkî ra çokan ser o, sereyê xo kerdbî bênateyê destanê xo, bi destanê xo goşê xo bi hewayêko pêt padaybîye, la heto bîn ra?

Heto bîn ra vengê xoverdayîşê berfînan, vengê asmênî yo kewe, vengê boranan...

Çi vengêko mûazzam, çi serewedaritîşêko bêemsal!

Xo pawitiş, xo newe ra afirnayîş...

Hêdî hêdî çimê xo akerdî û derûdorî ra ewnîyaye la wina biters û xerîb...

Veng birîyabî seke...

Raşta zî veng birîyabî eceba?

Wina bi matmendiş çimî çarnayî dormareyê xo ra.

Seke vajo ke herkes senî nê vengî ra pey wina bi rehetî têgêreno ke!

Xo têwnêda demêk, wina bi ecêbnayîş xo bi xo qalî kerd. Fekê xo de tayê çîyî pilpilnayî.

Eceba mumkun bi ke no veng tena aye bieşnawite bo!

No vengo ke çend rojan de, çend aşman de, heta beno ke çend serran de reyke goşê ci kerdêne kerr, no vengo ke sere ra heta lingan aye recifnayêne.

No vengo ke piştîya ci ra areqêko serdin heriknayêne, la kûrînîya zerrîya xo de germinîya xoverdayîşî zi dayêne hiskerdene.

Raşta zî eceba tena aye eşnawitêne nê vengî! Mumkun nêbi helbet! Nêkewtêne sereyê ci.

Demêk wina sey xîntan vinderte, dormareyê xo ra ewnîyaye.

Bi çimanê xo yê meraqînan gêrayêne çîyêkî seke.

Seke waştêne bi sivikîya pelêkê huşkî, cuya xo ya vindîbîyaye de rêçêke bivîna û bikewa dima.

Rayîrêk...

Rayîrêk tena.

Rayîrêko ke peynîya ci de bireso xo.

La ser o çendêk dem vîyartbî qe nêzanayêne.

Aşmêke, serrêke beno ke emrêk zî bo. Muhîm bi qey? Qetîyen ney.

Gelo şima qet vengê serewedaritişî eşnawito?

Vengê xoverdayîşî...

Waştêne ke nê vengî ra bixelesîyo yan no xora vengê xelasî bi ci rê, nêzanayêne.

La zanayêne ke her ke nê vengî bieşnawo do vengê xo zî hîna pêt bieşnawo, do vengê herre linganê aye ra hîna zêde bilefîyo la do vîç vîçê teyr û tûran zî bibedelîyo, tewr zêde zî yê boranan...

Tewr zêde zî vengê boranan ra tersayêne xora.

La êdî vengî a qet nêtersnayêne. Musaybî êdî çunke.

Nişka ve ra vengêko nas biaramî herikîya ame goşanê aye de pispisna.

Bi peşmirîyayîş verar kerd no vengê yê serran.

Bi peşmirîyayîşêko aramî çim şikit aye înan rê.

Boranî...


Seke ê zî paweyê na game bîyî...


Nika wext wextê vengê vîç vîçê boranan bi êdî.

Wext bi vîç vîçê boranan xo xemilnayîş bi êdî.

Wext bi keweyîya asmênî xo têbestene bi.

Wext bi perranê boranan kiriştişê vengî bi.



Paşa Şeker

# Rêxa Qatix

Xalê Mistefa ji gundekî farqînê ye. Navê gundê wî jî reşika Şêxdada ye. Xalê Mistefa û hevalekî xwe bazirganiya sewalan dikin. Diçin Mûşê li wir sewalan distînin û qonax bi qonax berê xwe didin Amedê.

Dema dikevin axa Çewligê digîjin kîjan malê xwediyê malê bi lez sewalên wan

dihewîne û demildest ji wan re xwarinê tîne. Xalê Mistefa û hevalê wî bi keyfxweşî li

benda xwarinê disekinin. Dema xwarin tê mêze dikin ku toraq e Xalê Mistefa û hewalê wî bê

madê xwe xwarina xwe dixwin. Adetekî Çewligê jî heye dema mêvan bên di cih de xwarinê datînin

ber wan û derdikevin derve ji bo mêvan di xwarina xwe de fedî nekin. Êdî digijin kîjan

qonaxê xwediyê malê bang dike û dibêje zû ji mêvanan re qatix bînin. Dema tên mêze dikin

ku toraqe. Ev rewş di hemû malan de dubare dibe.

Xalê Mistefa êdî li ku dinêre spî dibîne. Bi hêviyeke mezin digîjin maleke nû ku xwarineke cuda were ber wan lê mixabin dîsa toraq tê ber wan.

Kesê ku xwarinê tîne ciwanekî bîst salî ye. Xalê Mistefa êdî sabra wî diqede û ji wî ciwanî dipirse. Xorto ka ji apê xwe re bêje gelo navê vê xwarinê çi ye. Xorto bersiv dide û dibêjê navê wê qatix e. Xalê Mistefa serê xwe dihejîne û dibêje; Gelo ev nîmet hûn cot dikin, ji daran berhev dikin, ev ji çi çêdibe. Xortê malê jî bi dilekî saf dibêje; Na na apo ma qey ti şîr nizanî. Xalê Mistefa dibêje; belê ez dizanim. Xorto dibêje; em şîr dikelînin dikin mast . Xalê Mistefa dibêje belê ez wê jî dizanim.

Xorto dibêje em mast dikin meşkê diken, yên serî em berhev dikin û dixin kupan, yên jê mayî em dikelînin dikin qatix . Xalê Mistefa dibêje berxê xalo li ba me ji wê nîmetê re dibêjên rêxa qatix, qurbana çavên te tu here ji me re yê di kûp de bîne.

Niha em vê çîrokê hinekî şîrove bikin. Welatê ku demokrasî lê pêş ketine qatix (şîr

Mast,rûn) ku em jê ra dibêjin qatix li nav welatiyan bi teşekî wek hev tê belavkirin. Ku

Navê wê dibe demokrasî. Lê mixabin welatên ne pêşketî wek Rojhilata Navîn û welatên

misilmanan piranî tenê zumrekî biçûk van nimetan dixwe.Yên mayî jî toraqê dixwin.Navê vê jî

dibe demokrasî. Lİ çar perçeyên Kurdistanê ev kesên ku welatê me dagirkirine ne

hewceye ku ji me re qala demokrasiyê bikin.

Wek gotina Xalê Mistefa, berxê min tiştên ku qal dikin ew dibe rêxa demokrasiyê. Em tu carî zilm û zordariya ku li Kurdan hatiye kirin ji bîr nakin. Heke demokrasiya we jî ev qatix û toraq be em vê demokrasiyê qebûl nakin. Em hemû mafên xwe dixwazin. Em nîvişkê kûp dixwazin ku bi azadî û wekhevî sûdê ji xêr û xêratên welatê xwe bibînin.




# Tiştanok

Gelî hêjayan; mamik an jî tiştanok çandeke kevnar a gelê kurd e ku berê di civat û şevbêrkên xwe de ji hev dipirsîn. Me dîsa ji we re çend tiştanokên xweş amade kirine. Em hêvî dikin ku bi dilê we bin.

***1-*** Her roj diçe dibistanê lê tiştek nizane. Ew çi ye?

***2-*** Tu bixwî dikeve ber diranan tu nexwî dibe gul li gulistanan. De bêje ew çi ye?



***Bersivên me ev in:***

***1-*** Çente ***2-*** Dendikê gulan

# Dizê dest sivik


**Miradê Dêrikê**

Xelefo û hevalê xwe yê Amerîkî bi hev re çûn marketê. Hevalê wî yê amerîkî ji Xelefo re got ka binêre destê min çiqasî sivik e û bi lez rahişt 3 çokalatayên Venchi û xiste berîka xwe. Xelefo hinekî fikirî û got ma ev jî tiştekî zehmet e, tu yê niha bibînî ez çawa dikim.

Piştî ku Xelefo û hevalê xwe yê Amerîkî çûn ba kasiyer, Xelefo jê re got: Tu ji sihirbaziyê hez dikî? Kasiyer got; erê. Xelefo got ka 3 çokolatên Venchî bide min. Xelefo her sê çokolata xwar û ji kasiyer re got; ka li berîka hevalê min binêre waye ew her sê çokolata di berîka wî de ne. Kasiyer destê xwe davêje berîka hevalê Xelefo û dibîne waye her sê çokolata tê de ne. Xelefo paşê ji hevalê xwe re dibêje te destsivikiya xwe dît kurê kerê.



# XAÇEPIRS




## JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ VE

***3-*** Qul ***5-*** Daçekek ***7-*** Tevahî ***8-*** Agir ***9-*** Karekî cotkaran ***13-*** Welatekî ereb ku beşekî Kurdistanê tê heye ***14-*** Arvan ***16-*** Derew ***19-*** Bajarekî rojavayê Kurdistanê ***20-*** Yekem televizyona kurdî ***21-*** Noteyeke muzîkê ***22-*** Bersiva erênî ***25-*** Sewaleke ku ji bo goşt û hiriya wê tê xwedîkirin ***26-*** Destvekirîtî ***28-*** Aşiq


## JI JOR BER BI JÊR VE

***1-*** Navê hunermendeke jin …….Rezazî
***2-*** Paytexta îtalyayê
***3-*** Cînavkeke pirsiyarî
***4-*** Nîşe
***6-*** Kesên ji Iraqê
***10-*** Ne nêzîk
***11-*** Navê herêmekê (Rojhilata ……
***12-*** Ne germ
***15-*** Xerîbî
***17-*** Cihê ku êmê sewalan dixin nav
***18-*** Biyan
***20-*** Cemidî, sar (Bi dimilkî)
***23-*** Eşîrî
***24-*** Kar û xebat
***27-*** Rojeke hefteyê

## Bersiva hefteya borî



# Ew mehkûm, bersûç û dozdarê Tirkiyeyê bû




|| Servîsa Çandê

**Rewşenbîr û zanyarê kurd Apê Mûsa ji bo azadiya gelê kurd û Kurdistanê ked û bedelên giran da. Bi minasebeta salvegera şehadeta Apê Mûsa em wî bi rêzdarî bi bîr tînin û kurte jiyana wî bi xwînerên xwe re parve dikin.**

**Ronakbîr û rewşenbîrê kurd Mûsa Anter bi navê din Apê Mûsa di sala 1920an de li gundê Zivingê yê bi ser Stilîliyê ya Nisêbîna Mêrdînê ji dayik dibe. Apê Mûsa hêj zarok bûye bavê wî diçe ber dilovaniya xwedê. Li ber destên dayika xwe Feslayê mezin dibe. Dayika Fesla jineke gelekî jîr û jêhatiye ku di salên 1930-1940an de muxtariya gund dike. Di heman demê de dibe muxtara pêşîn a jin a bakurê Kurdistanê.**

**Apê Mûsa dibistana xwe ya seretayî li Mêrdînê û ya navîn û lîseyê li Edeneyê dixwîne. Piştî xwendina lîsê jî ji bo felsefeyê bixwîne diçe Stembolê. Li Stenbolê gelek xwendevanên kurd nas dike. Apê Mûsa, li ser daxwaza Fayîq Bucak dev ji felsefeyê berdide û qeyda xwe li beşa Huqûqê çê dike.**

**Serdemeke hayjixwe hebûnê û şiyarbûnê ye. Lê di haman demê de tirsek jî heye. Hevgirtin û xwerêxistinkirin hêsan nîn e. Di wê demê de xwendevan û rewşenbîrên kurd ji bo pirsgirêka neteweyî dikevin nava tevgerê. Di destpêkê de ji bo xwendevanên kurd Wargeha Dicle vedikin. Piştî salek jî komeleya Hêvî 1942 da dimezirînin.**

**Apê Mûsa di sala 1959an de ji ber doza 49an tê girtin û tevli 49 hevalên xwe 6 mehan di girtîgehê de dimîne. Apê Mûsa pirtûka xwe ya bi navê "Birîna Reş" di zindanê de dinivîsîne. Her wiha ferhenga kurdî ya bi 6 hezar peyvan pêkhatî, amade dike. Apê Mûsa bi siyasetê re jî elqedar e û di sala 1971an de careke din tê girtin û piştî ji girtîgehê derdikeve, di 1976an de vedigere gundê xwe û heta 1989an li gund dijî.**

**Apê Mûsa di 89an de careke din vedigere Stanbolê, di gelek kovar û rojnameyan de dest bi nivîsandinê dike. Di gelek kovar û rojnameyên wekî Welat, Ulke, Ozgur Gundem û Ozgur Ulkeyê de nivîsên wî têne weşandin, ji hêla xwendevanan ve bi baldarî tên xwendin. Di heman demê de di nava Partiya HEPê de ji nû ve dikeve nava siyasetê.**

**Ronakbîr û rewşenbîrê kurd Apê Mûsa dibe hedefa dewletê û di 20ê Îlona 1992yan de li Taxa Seyrantepeyê ya Amedê ji aliye hêzên dewletê ve tê kuştin. Apê Mûsa anku Musa Anter di pirtûka xwe ya "Hatiralarim" de wiha dibêje: "Ez şahidê zindî û sondxwarî yê tengasiyên Tirkiyeyê yê 55 sala me. Gelo ez tenê şahid im? Na! Ez her wiha mehkûm, bersûç û dozdarê Tirkiyeyê me."**

**Belê Apê Mûsa di jiyana xwe de her tim bi hişmendiyeke kurdî û neteweyî jiyaye û ji bo azadiya gelê kurd û Kurdistanê têkoşiya. Di gelek qadên wekî çand, wêje, ziman û ragihandinê de ked daye. Ji bo bi sedan ciwanên kurd bûye çavkaniya hêz û têkoşînê. Îro jî bi sedan şagirt û şopînerên Apê Mûsa di Çapemeniya Azad de dane ser rêça wî û ala azadiya gelê xwe bilind dikin.**

# ÇÎROKEK KAFKAESK; Navnîşan



Mazlûm Baran

Navnîşan ne tenê çîroka gundekî nediyar e; bi awayekî estetîk û serkeftî vegotina nedîtin, nenasîn, qebûlnekirin, tunekirina nirxên gel û erdnigariyekê ye. Di dawiyê de em dibînin gundê ku mamoste lê digere gundê wî bi xwe ye

Kurtefîlma Navnîşan ji hêla Aram Dildar ve di sala 2022yan de hatiye çêkirin. Çîroka fîlmê ji dawiya salên heftêyî ye. Lê çîrok di serê sedsalê de bi avakirina Komara Tirkiyeyê dest pê dike.

Piştî avakirina komara netewedewleta Tirkiyeyê hemû kêmnetew, gel û baweriyên cuda tên çewisandin. Çand, ziman, cil û berg tên qedexekirin. Lê ji bo ku gelan, civakan yek car tune bikin hewl didin bîra wan jî ji binî ve jê bibin. Yek ji kiryarên wan a di çarçoveya van polîtikayan de jî qedexekirina ziman û navan e. Him navên gelêrî tên qedexekirin, him jî navên der û dor, gund û bajaran tên guherandin. 28 hezar wargehên navên wan hatiye guhertin hene ku yek ji wan jî dibe mijara fîlma Navnîşan.

Çîroka fîlmê ji serpêhatiya rastîn a mamosteyekî tê. Derhêner, di bin bandora vê çîrokê de dimîne û zendan badide.

Mamosteyekî Amedî ji bo mamostetiyê bike wî dişînin gundekî Amedê. Pirsgirêk li vir dest pê dike; gundê ku mamoste tê şandin gundekî di nexşeyan de navê wî tune ye û di belgeyên fermî de jî hebûna wî nayê qebûlkirin. Ji ber ku dewlet hewl dide nav û çîroka der û dorê, gundan, bajaran ji bîra gel jê bibe lewma gundê ku tayîna mamoste lê hatiye kirin bi navê xwe yê rastî qebûl nake. Lê navê ku dewletê lê kiriye jî di nav civakê de nayê zanîn û nayê qebûlkirin. Di nav dewlet û civakê de valahiyek heye ku kesayetê sereke ê fîlmê di valahiyê de asê dibe. Fîlm, vê valahiyê him bi çîroka xwe a dramatîk û him jî bi dîmenan bi awayekî serkeftî vedibêje.

## Gund nexuyaye

Mamoste ji bo dest bi kar bike hewl dide biçe gund, lê gund nexuyaye. Gundekî li der û dora gundê wan e, lê xelkê wan gundan hay ji wî gundê bi navê fermî Yeşîlkoy tune ne. Ji bo gund bibîne serî li saziyên fermî dide lê na, lê xebatkarê dewletê ku bi xwe jî kurd e, li belgeyan dinihêre lê nabîne. Bi mamoste re bi kurdî diaxivin heta dengê derî tê, piştre derbasî tirkî dibin. Em qet nabînin bê kî hatiye, lê tirsa ruyê wî ji me tevan re pir nas e. Em dizanin kesek ku dewletê dinimîne û bikaribe giliyê wî bike hatiye hundir. Germahiya gava din namîne, êdî ew sarbûna dewletê dikeve nav her duyan. Gundekî bi vî rengî di belgeyên wan de jî tuneye. Çareserî navenda komarê Enqere ye, lê agahî pir dereng diçe û tê. Têkiliya paytexta serdestan û bajêrê ku lê ye jî tune ye. Saziya fermî nabe çareserî, çareserî li navendê ye lê ji bo wê jî bêhêvî ye ji ber ku pergal pir tiral e û ji rastiya jiyana xwecihî jî dûr e.

## Dewlet civakê nas nake

Mamoste xwe bi xwe dest bi lêgerîna gund dike. Lê li gundên der û dorê hemûyan digere ne gund dibine ne jî rastî kesekî ku gund dîtiye an bihîstîye tê. Di rê de xuya dike ku tu têkiliya pergala mêhtinger û civakê tune ye. Dewlet civakê nas nake li dijî nirx û bîra wê şer daye dest pê kirin. Gel jî vê pergalê qebûl nake. Mamoste di nav vê nakokiyê de di nav lêgerînê de ye lê ne tenê li du gundekî ye, ketiye dû rastiya ku hatiye veşartin û hewl didin bidin windakirin e.

## Nagihêje cihê xwe

Mamoste dibe wek kesayetên Kafka. Di çîroka wî a bi navê "Qesr" de "K" ji bo kar bike tê gundekî. Di gund de qesrek heye ku gund bi rê ve dibe. Qesr li serê girekî ye û K dike nake nikare bigihije Qesrê. Li pêşiya K, astengiyên burokratîk û razber hene ku nahêlin tu carî bigihije armanca xwe. Li dû armanca xwe diçe lê tu carî nagihije armanca xwe. Di çîrokê de karakter neçar



hîs dike û bêwatebûna hewldana li dijî pergalê nîşan dide. Astengên piçûk in lê tu carî nikare wan astengan derbas bike. Kesayet dikeve valahiyekê, di nav wê valahiyê de digevize. K yê ku di nav alozî, nediyarîyê de digevize û hewl dide pergalê fêhm bike û bibe perçeyekî wê lê tu carî tênagihije û nikare bibe perçeyekî wê. Di Navnîşanê de jî mamoste ji hêla dewletê ve tê şandin lê bi tu awayî nagihije cihê xwe yê kar. Dewlet ji bo pirsgrêka wî çareseriyekê jî nabîne. Berovajiya vê karmendê dewletê heta bêjî bêhêvî ye. Wek nûnerên dewletê ên li vir leşker, dikevin pêşiya wî, ne lê guhdar dikin ne jî jê bawer dikin. Wî binçav dikin û lê didin. Di heremê de kesekî ku bikaribe alikariya wî jî bike tune ye. Mamoste jî piştî lêgerîna xwe heman nêçariyê hîs dike. Di vir de kesayetê ku li dijî pergalê bênasname hatiye hiştin û dest û pî girêdayî dibînin, tenê çîroka kesekî ye pê re gelekî ku dixwazin tune bikin heye. Her çiqas çîrok li ser pişta mamoste be jî ê di wê valahiya nav rastîya erdnîgarî û pergalê de digevize gel bi xwe ye.

## Tunebûna navê gund

Navnîşan, çîroka nedîtin, neqebûlkirin û bîyanîbûna xwe vedibêje. Navnîşana ku mamoste here tune ye, ne dîyar e, li dû wê Navnîşanê winda dibe. Her çiqas wek çîrokeke piçûk xuya bike jî Navnîşan peyameka xurt a civakî, mirovî û polîtik dihewîne. Ji destpêkê heta dawiyê di navenda fîlmê de "nedîtin, ne qebulkirin" û li dijî van şerê xwe nasînê û li xwe gerînê heye. Tunebûna navê gund di belgeyên fermî de ne tenê pirsgrêkeka piçûk a bûrokratîk e, ne naskirin û tunekirina qada jiyanê ya gelekî ye. Mamoste di vir de, li hemberî vê ne naskirinê, li hemberî tunehesibandinê li ber xwe dide. Helbet vê berxwedanê bi zimanekî sade, xwezayî vedibêje. Di kadrajê de dîmenên berfireh hene piranî. Em valahiya cîh, bêdengî û nediyariyê hîs dikin. Kesayetê fîlmê ku em di nav rêyên ku di valahiyek berfireh de, di nav tunebûnekê bêdawî de dibînin ne lehengek e. Tekoşîna wî jî ne wek a lehengan e, lê a kesekî herî ji rêzê ya di nav jiyana rojane de tê dîtin e. Çi dîyalog, çi jiyana wan, çi tevî ku heta dewlet xwe bide hîskirin nêzikatiya karmendê saziya fermî jî fîlmê ji melodramê dûr dixe. Filmekî zêde bi tevger nîn e. Vegotina fîlmê ya aram, sade, nakokiyên polîtik ên pişt çîrokê bandoreke xurt li ser temaşevanan dike.

Navnîşan ne tenê çîroka gundekî nediyar e; bi awayekî estetîk û serkeftî vegotina nedîtin, nenasîn, qebûlnekirin, tunekirina nirxên gel û erdnigariyekê ye. Di dawiyê de em dibînin gundê ku mamoste lê digere gundê wî bi xwe ye, em têdigihîjin ku lêgerîna mamoste ne tenê lêgerîna cihekî ye, lêgerîna xwe bi xwe ye.



xwebûn

15 - 21 Îlon 2025 / e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Hejmar: 300

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Abdullah Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Adar Gulan, Heval Dilbihar, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco, Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Kurt İsmail Paşa 2 Sk. Güneş Plaza No 18/5 **Yenişehir-Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

Ji bo abonetiyê
**Tel:** 0 (541) 806 84 85



Serdar Altan

# DI DÎROKÊ DE YEKEM GOLA ÇÊKER:
# Gola Rûsa



Mirov dema li Kurdistanê digere gelek cih û warên balkêş dibîne. Em dizanin ku gelek deverên ku nehatine keşifkirin hene. Divê mirov bigere û bibîne ji bo nasînê. Her wiha divê mirov lêkolîn bike. Gelek zanyariyên di derbarê hin deveran de bi senteza ger û lêkolînê mirov serwext dike. Ango mirov dikare bêje ne tenê ger, ne jî tenê agahî. Her du bi hev re baştir zanîn dide mirovan.

Ev car em dixwazin dîsa li serê bilindahiyek, ango di navbera çiyayan de devereke newaze bi we bidin nasîn. Ev der Gola Rûsa ye. Bi navên wê yê herî tê zanîn Gola Keşîş, an jî Gola Qulingan (Turna). Ev der herêmeke girêdayî navçeya Payîzava ya Wanê ye. Li bilindahiya 2 hezar û 550 metre, di navbera çiyayên Kuh, Qezan û Çiyayê Reş (Erek) de ye.

Lê belê tişta ku vê gola newaze dike goleke taybet dîroka wê ye. Mirov dikare bêje gola yekem ya herî kevnar a cîhanê ye ku bi destê mirovan hatiye çêkirin e. Erê, we şaş ne bihîst, ev gol gola çêker e. Yanî bi destê mirovan hatiye çêkirin. Di serdema şaristaniya Ûrartûyan de hatiye çêkirin û di nava salan de bûye goleke xwezayî. Niha em ê hinekî bi berfirehî behsa vê gola bedew ya 2700 salî bikin.

**Mîrateya Ûrartûyan**

Me got gola Rûsa (em ê di berdewamê de behsa vî navî bikin) girêdayî navçeya Payîzava ye. Gol 30 kîlometre ji Wanê dûr e. Ew navên wê yên me li jor rêzkirin her yek bi xwe xwedî çîrokekê ye.

Berî 2700 salan, di dema şaristaniya Ûrartûyan de, Qral Rûsa yê duyem (BM 685-645) ev gola çêkiriye. Lewma navê golê weke "Gola Rûsa" jî tê zanîn. Armanca Qral Rûsa ava ji bo avdana zeviyên çandiniyê dabîn kirin bû. Ev bendav ji wan karên endezyariyê yên herî girîng ên serdema Ûrartûyan e ku weke gelek berhemên vê şaristaniyê heta roja îro hatiye.

Ev golbendav bi demê re bûye goleke xwezayî û bûye bihûştek ji bo teyr û tilûran. Ev guherîna ji çêkirî ber bi xwezayî ve nîşana hêza xwezayê ye ku çîrokeke nû ya jiyanê li ser bingeha kevnar ava dike.

**Erdnîgarî û çiyayên derdor**

Gola Keşîş li ser bilindahiyeke 2 hezar û 550 metre, di navbera çiyayên Kuh, Qezan û Çiyayê Reş de cih girtiye. Ev çiyayên mezin di navbera xwe de deşteke fireh hiştine. Dema bi avê hatiye tijêkirin jî ev der bûye parçeyek ji bihuştê.

Çiyayê Reş yek ji çiyayên herî mezin ên herêmê ye ku bi çiçekên zer ên berê dibe malpera xweşî û şahiyê. Bajarê Wanê jî li quntara wê avabûye. Lewma hem ji bo xweşiya xwezayê, hem jî ji bo domandina jiyana mirovan bûye wargeh ji tevahiya Waniyan re.

Çiyayê Kuh, bergeha kevnar ku dîroka gelê Kurd tê de veşartî ye, jîngehe ji bo lawiran û zindîwaran. Tevahiya xwaşiya xwe bi herêmê re parve dike.

Çiyayê Qezan, bi navê xwe yê kurdî, girîngiya çandî ya herêmê destnîşan dike. Dibe destebirakê van herdu çiyayên din. Gola Rûsa bi baskên xwe radipêçe.

Ev her sê çiya dibin sedem ku Gola Keşîş dibe xwedî hebûnek. Kombûna ava wê xwe dispêre çiyayan. Û her wiha çavkaniya xwe jî ji kanî, sûlav û rûbarên ji van çiyayan dizên digre. Ev çiya gola çêker av didin, xwedî dikin û dibin wesîle ku ev gol bibe goleke xwezayî.

**Navên cuda û çîrokên wan**

Me got ev gol li herêmê bi navên cuda tê zanîn. Dibe ku di nava 2700 salan de her serdemê bi navekî cuda hatibe binavkirin. Yên ku em dizanin sê-çar navên navdar in.

Jêre gotine gola Keşîş, ji ber keşîşên ku berê li vir dijîyan. Bi navê gola Rûsa hatiye binavkirin, ji ber ku navê çêkerê xwe, Qral Rûsayê duyem yê Ûrartûyan girtiye. Jê re gotine gola Qulinga (Tûrna), ji ber teyrên qulingên ku li vir dijîn û ev der ji xwe re kirine wargeh. Her wiha gelê herêmê jê re gotine gola Fireh. Em bawerin ji ber berga wî ya fireh ev nav jî lê hatiye kirin.

Gola Qulinga û çiyayên derdor bihuşteke ji bo gelek cureyên teyr û ajalan. Li vir teyrên girîng ên weke flamîngo, pelîkan, qaz, werdek û ya herî zêde quling dijîn. Her

> Li Wanê, li pişta Çiyayê Reş (Erek) goleke balkêş heye; Gola Rûsa. Di eslê xwe de bi navê Gola Keşîş an jî Gola Qulingan tê nasîn. Lê navê Rûsa ji dîrokê tê. Ev gol berî 2700 salan ji hêla Qralê Ûrartûyan Rûsayê duyem ve hatiye çêkirin û di

wiha teyrên baz û qertelên mezin yê çiyayan jî mirov dikare li derdora golê bibîne.

Gola Keşîş her wiha li ser rêya koçberiya teyr û ajalan di navbera Bakurê Afrika û Îranê de ye. Teyrên koçber bi hatin û çûna xwe vê xwezaya xweş dibînin û diçin mala xwe.

**Taybetmendiyên xwezayî**

Niha em hinekî jî behsa taybetmendiyên golê bikin.

Gola Keşîş li bergeheke fireh û di nava çiyayên bilind de cih girtiye. Bilindahiya wê 2550 metre ye, ku wê dike herêmeke hênik ji bo teyr û ajalan. Qada golê li gorî barîna berf û baranê di navbera 4-7 kîlometreqare de ye. Berga wî bi giştî 100 kîlometreqare ye. Dikare 20 mîlyon metrekup av di nava berga xwe de bihewîne.

Avên golê ji berf û baranên çiyayan pêk tên. Ev av paqij û zelal e, ji bo jîyana ajal û nebatan pir maqûl e. Dema gol tije dibe û ava wê zêde dibe bi wasita çemên ji derdorê ava xwe diherikîne. Li derdora golê mêrgên xweş û gulên rengareng hene ku bi taybetî di serdemên berê de xweşikiyeke bêhempa çêdikirin.

Li navbera Çiyayê Reş û Gola Keşîş kanyoneke xweş heye ku bi çîçek û gulên xweş hatiye xemilandin. Ev deşta kulîlkan bihuşteke ji bo dîtina xwezayê ye.

Bi taybetî di demên berê de, çiya û deştên li derdora golê bi gulên zer ên xweş dixemiliya. Ev dîmen weke çîrokên kevnare ye ku ji çav û dilê mirov nakeve dihatine gotin. Ji ber xwezaya xwe ya dewlemend her wiha ev der weke zozan hatiye bikaranîn. Roja îro jî dema bihar tê hin koçer û gundên derdorê berê xwe didin vê herêmê. Dema mirov diçe dîtina golê, li zozan û palên derdora golê rastî koçeran û kêriyên pez an garana dewaran tê. Sewalên ku li vir diçêrin para xwe ji dewlemendiya giyayên erdnîgarê digrin. Her wiha tê gotin ku goştê sewalên vê herêmê bi tehm û xweş e.

**Girîngiya çandî û dîrokî**

Weke tê zanîn şaristaniya Ûrartûyan bi sed salan hikum li herêma Wanê û derdorê kiriye. Tu niha jî li kîjan deverê binêrî bermahiyeke Ûrartûyan dikarî bibînî. Ji keleh, qesr û serayan bigre, heta xan û hemam û bermahiyên cuda ji wê serdemê man e.

Lê belê şaristaniya Ûrartûyan her wiha bingeheke bajarvanî, mîmarî û endezyariyê jî avakiriye. Bi vê jî bes nekirine û têkiliya mirov bi xwezayê re sazkirine. Ji siruştê sûd wergirtine. Hin tiştên wisa avakirine ku endezyariya roja îro jî nagihe wê zanyariyê. Weke mînak qenala Şamîranê yek ji van e. Dîsa ji bo bajarên ku avakirine ji deverên wisa dûr xeta avê kişandine ku aqilê mirov disekine.

Gola Rûsa jî yek ji van bermahiyên newaze û dîrokî a serdema Ûrartûyan e. Ûrartûyan dema ev gola avakirine xwestine ava bajarê Wanê ji vir saz bikin û deşta Wanê bi vê avê avdane. Her wiha qenalên ku ji golê kişandine Keleha Tûşba û Kelehên din yên derdorê gihandine ava zelal.

Mirov dikare bêje gola Keşîş ne tenê tabîeteke girîng e, her wiha belgeya dîroka kevnar a gelên herêmê ye. Bi biryara dewletê ev gol weke "Herêma Qedexe a Parastinê" hatiye diyar kirin.

Dîsa ev gol nîşana zanîn û jîriya kevnar a kurdan e li ser kar û çandiniyê. Ûrartû ku weke kok û rihên kurdan tên zanîn, bi çêkirina vê golê nîşandane ku wan çawa bi xwezayê re li hev kirine û ji xwezayê sûd wergirtine.

**Mirov çawa diçe?**

Gola Qulingan ji bajarê Wanê, an jî ji Payîzava ne gelek dûr e. Çend rêyên ku mirov xwe dikare bigihînê hene. Rêya herî nêz 30 kîlometre durî bajarê Wanê ye. Lê ev rê her demsalê rê nade ku mirov di wir de here. Rêyên din yek ji milê Payîzava, yek jî ji milê rêya Qelqeliyê digihîje vê herêmê. Lê belê ev rêyên ha jî mirov nikare bêje xweş in. Lewma zû bi zû kes berê xwe nade vê herêmê.

Lê hêj jî gol û çiyayên derdor gerok û turistên ku dixwazin xwezayê bibînin pêşwazî dikin. Ji bo gihîştina golê, divê mirov bi wesayîtê qasî saetekî rê biçe. Me got belê nêz e lê rêya wê ne xweş e. Lewma pêdivî bi maşîneke baş heye ku karibe bêpirsgirêk bi çiyayan ve hevraz bibe. Helbet kesên bi xwe bawer dikarin bi meş jî xwe bigihînin herêma golê. Ev rêbaz jî ji bo çiyageran guncav e.

**Xetereya li ser golê**

Mixabin, ev gola 2700 salî êdî weke berê zindîbûna xwe nikare biparêze. Pirsgirêka guhertina avhewayê û kêmbûna berf û baranê bandoreke esasî li vê golê kiriye. Wisa bifikirin; berî 2700 salî goleke wisa newaze hatiye avakirin lê roja îro ku ewqas cîhan bi pêş ketiye gol bi heqî nayê parastin. Ev jî kêmasiyeke esasî ya mirov û pergalên vê serdemê ye.

Gola Keşîş ne tenê goleke avê ye, her wiha yek ji navenda çand û dîroka Kurdistanê ye. Ew ji aliyê endezyariyê ve berhekariyeke mezin a dema kevn e, ji aliyê xwezayê ve bihûştek ji bo gelek zindîwaran e û ji aliyê çandê ve jî belgeya hêja ya zanîn û çalakiya gelê kurd e ya li ser avdana zeviyan e.

Di demeke ku guhertinên avhewayê pirsgirêk çêdikin de parastina vê golê erka tevahiya mirovan e. Ew ne tenê ji bo niha, lê ji bo pêşerojê jî divê were parastin. Ji ber ku gola Rûsa mîrateya me ya pîroz e ku ji dîroka kevnar heta roja îro têkiliya mirov û xwezayê ava kiriye.



Wêne: Rohat Bulut

## Bêwar û bênasname mayîn!

*Li navçeya Sûrê ya Amedê, dayika li binê siya dara tûyê li derdora wê ne neviyek, ne cîranek, ne jî jiyaneke civakî. Li pişt wê dîrokeke hilweşiyayî, li şûna wê jiyaneke wêrankirî û li pêşberî wê jî bermahiyên şerê taybet û avahiyên bênasname. Ev wêneyê heqîqetekê ye.*